

ARMANC
Ji mehê
carekê
dertê
Hejmar: 89
Sibat
1989
Buha: 10 Skr.
2.5 DM

Armananc

SERXWEBÛN DEMOKRASÎ SOSYALÎZM

ARMANC
Monthly
Kurdish
Magazine
No: 89
February
1989
Price: 10 Skr.
2.5 DM

Rapora Amnesty

Li Iraqê zarok tên îşkencekirin û îdamkirin

Rapora Amnesticî dide xuyakirin ku;

□ Gelek zarok jî ji dêvla malbat û mezinên wan wek rehîn tên girtin, da ku mezinên wan werin xwe teslimî hukûmetê bikin.

□ Gelek zarok jî piştî tên girtin, bê şop "wenda" dibin.

□ Di zindanên rejima dîktatorî ya Iraqê de kêmtirîn 30 metodên îşkencê tên bikaranîn

Di zindanên Iraqê de zordariya hov li hember zarokan bûye karekî rojan e. Gelek caran ji bo ku agahdarî li ser malbatên wan ji wan bîstendin xort tên îşkencekirin. Her wiha zarokên li ber pêşîrê jî pêrgî muamelên xirab dibin ji bo ku ailên wan sîncê siyasî bigrin ser xwe, ew sîncên ku tu carî nekirine.


Girtiyekî siyasî ku 5 meh li cem îdara ewlekarî ya sirrî li Al-Karkh di bin çav de hat girtin berî ku bê berdandî Nisana 1985'an de ji Amnesty International (Rêxistina Efxûyê ya Navnetewî) bahs kir ku çawa aîla wî li ber çavê wî ji bo ku sîncê xwe yê siyasî qebûl bike hat îşkencekirin.

Yê girtî her weha behsa wê rewşê dike ku zarokên li ber pêşîrê di gelek hefsên Iraqê de çawa girtî tên hiştin: "Pirranî zarokên wiha

tevî dê yan jî bavê xwe di hucra de tên girtin û nahêlin şîr bixun ku dê û bavên mecbûrî îtîrafê bikin. Min zarokêkî 5 mehî dît ku di vê rewşê de diqijîya".

Li gor tespîta rapora Amnesty International, li dijî mafê mirovayî û li dijî qanûnên Iraqê bi xwe jî zarok tên îdamkirin, bi armancên siyasî tên kuştin yan windakirin. Rapor di nav wan de navê hin kesan dide ku Kurd in û hinekên wan jî terefdarên PDK-I in. Her wekî:

Rizgar Abdullah, 16 salî, tevî 13 Kurdên din li Mûsilê di 28'ê Çileyê Pêşîn ê 1987'an de hat îdamkirin. Îsmail Azad û Latîf Adel her du jî 15 salî ne, tevî 7 Kurdên din li kampa Faîda di 18'ê Çiriya Paşîn a 1987 an de hatin îdamkirin. Segwel Misho Miho, 17 salî, tevî 6 Kurdên din her li wê



Sangar Fexredîn Neclp, 10 salî yek ji birîndarê Helepçê

kampê di 10'ê Çileyê Pêşîn ê 1987'an de hat dardekirin. Abdil Rahman Ahmed 17 salî bû gava di zindana Ebû Xureyb a li derveyî Bexdayê hat îdamkirin.

Rapor dide xuyakirin ku van salên dawîn dardekirinên pirranî, bêyî mahkeme bi biryara hukûmetê pêk hatin. Girtî pêk ve bi grûbî hatin îdamkirin bêyî ku bîst mahkemekirin. Piraniya qurbanan zarok û ciwan bûn.

Di dawîya Adara 1986'an de hêzên pêşmerge yê Kurd teşebusî kuştina waliyê Erbilê kirin. Ew, di êrişê de birîndar xelas bû. Ji bo hilanîna heyfa vê yekê, li Erbilê ji Unîversîta Selahaddîn 15 xwendevan hatin girtin û tevayîya wan li meydana bajêr li ber çavê xelkê di navbera 27'ê Adarê û 3'yê Nisana 1986'an de îdam kirin.

Di Çiriya Paşîn û Çileyê Pêşîn ê 1987'an de di heft carên cuda cuda de bêyî mehkeme 360 kes hatin îdamkirin ku umrê 17 kesên ji wan piçûk bûn. 150 Kurdên Suleymaniyeyî di zindana Ebû Xureyb de hatin îdamkirin. 8 kesên ji wan xwendevanên dibistanê bûn.

Berpirsyarên hukûmeta Iraqê ji bo laşê kesên ku tên îdamkirin teslimî malbatên wan bike 300 dinar pere ji wan distîne.

Dûmahîk r.11

Almanya Federal:

HEVKAR hat damezirandin

Li Almanya Federal federasyonê nuh bi navê HEVKAR (Hevgirtina Komelên Karkirên Kurdistan) hat damezirandin.

Kongra HEVKAR'ê a yekem di 7'ê Çileyê Paşîn 1989'an de çêbû. Ji bo balkişandina raya giştî belavokê hat belavkirin. Li gorî vê belavokê wê xebata HEVKAR'ê du bi alî bê

meşandin; parastina mafên karkirên Kurd yê aborî, demokratîk û kulturî ya du-duyan jî alikariya tevgera Kurdan a netewî ku li Kurdistanê têdikoşe.

HEVKAR di belavoka xwe de eşkere dike ku ji bo pêşvebirin û alikariya tevgera netewî û demokratîka Kurd li derveyî welat pêwendiyê xwe ji komunistan

heta dîndaran bi hemû hêzên humanîst re deyne.

Ji alî din ve HEVKAR dide xuyakirin ku, yekîtiya xebata karkirên Kurd a di warê demokratîk, aborî û kulturî de li Almanya Federal wê armancek ji wan armancên bingehîn be.

Damezirandina HEVKAR di xebata Kurdên dervayî welat de gavek bi rûmet e.

Esîrên kampên penaberan (r: 4)
Maria Leissner

Pêşdeçûyina Kurdzaniyê
li Ewrûpa (r: 5)
Rohat

Li Stenbolê hevpeyvîn
bi karkerên Kurd re (r: 6)

Afganîstan ber bi ku ve? (r: 12)

Rojeva Mehê

Ma Salman Ruşdi tenê layiqî azadiyê ye

Li ser romana Salman Ruşdi ya bi navê "Ayetên Şeytani", ev ji mehekê zêdetir e ku ba û bagerek hatiye rakirin. Ji alîkî de Îmam Xumeynî fetwa qetla Ruşdi da û bi milyonan dolar kir mukafat ji bo kesê ku wî bikije. Bi hezeran, deh hezeran insan, di dinya îsla-mî de derdikevin kuçe û kolanan, daxwaza serê Ruşdi dikin. Li Pakistan û Hindistanê ji dehan zêdetir insan serê xwe di vê riyê de dan ji. Li aliyê din hukûmet, dezge û ronakbirên Ewrûpî, li dîji fetwa Xumeynî rabûne piya, doza azadiya fikri ya Salman Ruşdi dikin. Ewrûpî diplomatên xwe ji Îranê vedixşinin, dixwazin ambargoyek abori deynin ser Îranê, cih lê teng bikin. Gurme gurma defa propagandayê ji du aliyên ve guhê miletan ker, serê wan gej dike.

Miletên Musulman ketine wê tirs û xofê ku xwedêgiravi seferê nuh a dinya xaçperestan dest pê kiriye, dixwaze dinê îslamê daqurtine. Miletên Ewrûpî ketine gûmana we yekê ku xwedêgiravi fanatizma îslamê rabûye pêdarê di hemla rakirina medeniyet û fikir û jiyana azad de ye. Li hember hev Milet û gel li hember hev dikevin şikê, di bin re ji hev dûrbûn û dijminatîyek tê avakirin.

Lê gelo ev tablo rastiya buyere dide nişandan yan na? Gelo rastî çiyê? Yê ku li bersiva van pirsan digerin gelek kêman û di vê xirecirê de dengê wan ji nagihê miletan. Lê çî dibe bira bibe, kesên ku rastî û çerçeva heqîqî ya meselê dibinin, divê dengê xwe rakin, ji herdu aliyên ve bala miletan bikşinin ser rastiye.

Kitêba Salman Ruşdi, ne lêkolîneke ilmî ya tarîxî ye. Romanek e ku ji xwezî, xayal û fantazyên wî pêk hatiye. Dibe ku hin tiştên wî rast, hin jê ji şaş bin. Heta dibe ku hemû ji ji derew û bêbextîyan pêk hatibin. Bi çî hawayî dibe bira bibe helbet ev yek heq nade tu kesî ku biryara kuştina xwediyê fikrê bide an wî bikuje. Her insan divê xwedî azadiya fikrî be, tu sedem yan bahane nikaribin wî mafî ji tu kesî bistînin. Tarîxa insanîyetê nişan daye ku kuştin û tunekirin, fikir ji holê rakirîye. Fikir ji hemû tiştî xurttir û jindartir e. Ê fikrekê pûç bike yan ji ji holê rake, cardin fikir bi xwe ye. Loma ji biryara kuştina Salman Ruşdi bir û baweriyên hundurê kitêbê pûçnekirîye, bi eksê wê rê vekirîye ku zêdetir belav bibe.

Ji aliyê din ve divê bi çavekî mezinkirîne ji meriv li aciziya nav miletên Musulman nenêre. Rast ne rast, baweriyên dinî di nav xelkê de xurt in, bi hezar salan di nav miletê kok dane, xelk hebûna xwe di vê baweriyê de dibinin. Fanatizm bi awakî hişkîr wan bi din ve girê dide. Gava pêrgiyê tiştêkî dîji baweriyên xwe dibin, dinya li wan berovaci dibe. Xebata rakirina baweriyên hişk û fanatik roçandina bir û bawerî, zanîn û kulturek rasyonel û ilmî, helbet gelek wext jê re divê. Îro li ser Îsa û diya wî ji gava tiştên ne li gor baweriyên dinî tîn gotin, acizî di nav miletên Xiristîyan de gurr dibin, munaqesên tûj û dûr û dirêj rû didin.

Gava em bî ser mesela reaksiyonan li hember biryara kuştina kesekî xwedî fikir, reaksiyona her mirovî, bi taybetî ya ronakbiran ne ku bes tebîî, berpirsiyarekî bivê nevê ye ji. Lê bi rastî gava meriv dibine

Dûmahîk r. 11

Ji dawa Dev-Solê:

"Tirkiye, gundên Kurdan bombe dike, gundiyan qetildike"



Yek ji berpirsiyare Dev-Solê di mehkemê de parastina musterek dixwîne (Foto: Fuat Kozluklu)

Dawa Devrimcî Sol (Şoresgerên Çep) ku beriya 12'ê îlonê destpêkiribû hin ji dom dike. Nuha girtiyên dawa Dev-Solê parastina xwe dikin. Di parastina xwe de xwedî ji rêxistina xwe xwedî derdikevin, Marksîzm-Lenînîzmê diparêzin, diktatoriya faşîst a 12 îlonê rûş dikin. Girtiyên Dev-Solê di parastina xwe de her wiha cî didin têkoşina netewê Kurd û polîtîka dijminatî ya diktatoriya faşîst jî.

Di bin sernivîsa "Rojhilata Navîn

herêma bagera emperyalîzmê, " de li ser bûyerên girîng ên herêma disekinin. Qala têkoşina gelê Filistîn û leystikên emperyalîzmê û di vî babetî de rola Îsraîlê tê kirin. Di vî beşî de bi awakî qenc li ser mesela Kurd jî tê sekinandin. Din beşê parastinê de girtiyên Dev-Solê weha dibêjin:

"Piştî tevgera Filistîn, li Rojhilata Navîn xeterê nuh serî da. Ev tevgera rizgarî ya netewê Kurd e. Ji bo olîgarşiya Tirkiyê, ji tevgera Filistîn

hin xetertir e. Lewra, ew Tirkiyê sererast eleqeder dike. Armanca Tirkiyê, her wekî hundur, li derveyî welat jî pelçiqandina tevgera Kurd e. Ji bo vê yekê çî ji dest hat kir, bi Iraqê re peymanek çêkir, di nav erdê Iraqê de bi tertîpkirina operasyonan êrîşî tevgera Kurd kir. Gundên Kurdan hat bombekirin. Gundiyan Kurd hatin qetilkirin".

Girtiyên Dev-Solê di parastina xwe de piştî şerê Îran û Iraqê li ser rewşa Kurdan radiwestin. Qala qetlîama Seddamê xwînmij û li hember weşeta çekên kîmyayî koçkirina bi sedhezaran Kurdan dikin. Di mesela qebûlkirina multeciyan de durrûtiya polîtîka Tirkiyê nişan didin û weha dom dikin: "Dijminên gelê Kurd, yê têkoşina gelê Kurd li welatê xwe bi xwîne difetisîne, tade û zulma cendirman li gundên Kurdan kirine karekî daîmî, li dijî gelê Kurd, li derveyî hudadan operasyonan tertîp dikin, nikarin qala mirovatiyê bikin. Tewrê pêşîn ên Tirkiyê li hember Kurdên multeci ku di nav hidûdê xwe de ew qebûl kirine ev bû; ew ji xelkê herêma tecrît kirin, bêçek kirin û di kampan de civandin. Bi vî awayî, Kurdên ku ji qetlîama Seddam xelas bûn, Tirkiyê di kampan da ew dil girt".

Wezîrê Kar û Barê Kulturî yê Tirkiyê:

"Em kitêban naşewtînin, dikin hevîr"

Di heşt sal û nivên rejîma Evren û Ozal de 38 ton û 368 kilo weşan hatin şewitandin û 40 ton jî di embarên polîsan de li benda şewitandinê ne.

Di nava "îcreatên" diktatoriya Enqerê de yek ji topkirin û şewitandina weşanan û mahkema û cezakarîna nivîskar, xwediyê çapxanan, wergêr û rojnamevanan ne.

Di heşt sal û nivên rejîma Evren û Ozal de 38 ton û 368 kilo weşan hatin şewitandin û 40 ton jî di depo û embarên polîsan de li benda şewitandinê ne.

Ji sala 1983'an û vir de di 1881 dawên mahkeman de 2792 rojnamevan, xwediyê çapxanan û nivîskar hatin mahkemekirin. Di heqê wan kesên de nêzî 2000 sal ceza û bi milyonan cezayê pere hat birin. Di nava weşanên ku hatine şewitandin de kitêb, atlas, ansîklopedî, kovarên siyasî, kovarên magazîn, rojname, kasetên muzîkê, kasetên vîdeo, teqwîm, qart û rehberên tolofonê jî hene.

Sebebên ku weşan tîn şewitandin li gor Mahkema Stenbolê ev in: kirina propaganda komunîzmê, pesindana tevgerên ku qanûn qedexekirine, kirina propaganda cûdaxwaziyê, îhlalkirina prensîba layîqîye, heqaretkirina li serokdewlet, serokwezîr, wezîr, ordî û hwd., heqaretkirina li manewiyeta Ataturk, û mustehcenî.

Wezîrê Kar û Barê Kulturî yê Tirkiyê Tinaz Tîtîz li ser mesela şewitandina weşanan dibêje ku: "Em kitêbar naşewtînin, wan dîsa dikin hevîr". Bi van gotinan Wezîrê Kulturî yê Tirkiyê xwe eşkere dike ku merivekî çîqa bi "kulture".

Newroz bi yekîti û qerardarî tê pîrozkirin

Cejna netewî ya gelê Kurd a azadî û ronahiyê Newroz, wek hersal îsal jî li der û deverên Kurdistanê û li her welatê Ewrûpayê ku Kurd lê dijîn, tê pîrozkirin.

Wek hersal îsal jî gelê Kurd di bin zilm û terora dewletên mêtînghekar de cejna xwe ya netewî bi dizî yan jî bi tewrîrên cûr be cûr pîroz dike. Pêşmerge li serê çiya, xwendevan di zanîngehan de, multeci di kampan de, karkir di fabrikan de, gundî di di gundên xwe de wê Newroza xwe pîroz bikin û wê yek saliya qetlîama Helepçe rûswe û rûş bikin.

Li gelek welatên Ewrûpayê, li Amerîkayê, û li Awûstûralyayê karkerî û multeciyan Kurd bi qerardarî û xemgînî bi şevên kulturî û muzîkî cejna xwe ya milî pîroz dikin.

Li Almanya Federal li bajarê Hambûrgê di 25'ê Adarê de Komîta Piştigiriya Tevgera Rizgariya Kurdistan (TEVGER), Cepha Kurdistanê Iraqê û Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê bi hev re Newrozê pîroz dikin.

Federasyona Komelên Kurdistan li Swêdê di 24'ê Adarê de li Stockholmê şevê dewlemend li çêdike. Di şevê de Şivan, Gulistan, Nasir Rezazî, Seîd Yusif û hin hozanên din wê beşdar bin.

Redaksiyon: M. Eli, Zinarê Xamo, Hesen Mizgin, Lewend Firat, Mirza Bextiyar. Redaktorê berpirsiyar: M. Eli. Berpirsiyare beşê Dimilkî: Malmisaniy

Adres : Armanc P. Box: 6004 172 06 Sundbyberg Sweden

Telex: ATTN ARMANC 11083 TELE KC. Telefax: ATTN ARMANC 46-8-208006


Ansvarigutgivare: Kurdiska Demokratiska Arbetar Unionen. Postgiro: 50 37 99-9. ISSN: 0348 7385

Parlamentêrên Swêdî ji kampên êsîran vejeriyan "Divê kamp bên girtin"

Heyetek ji 5 parlamentêrên Swêdî û yekî Danîmarkî ji bo lêkolîna rewşa kampên penaberan (multeciyan) li Kurdîstana Tirkîyê di ci de bibînin di destpêka meha Sibatê de çûn Kurdîstana Tirkîyê.

Di vê çûyîna xwe de, heyet li kampên Mûşê, Mêrdînê û Diyarbêkrê geriyar, rewşa multeciyan a xerab bi çavên serî xwe dîtî. Endamên heyetê piştî vejeriyan welatên xwe, beyanên gelek rexnegirî li dijî Tirkîyê dan rojname û televizyonên welatên Skandinavi. Ji vê heyetê, Parlamentêrê Partiya Sosyal Demokrat û abûqatê bi nav û deng Hans G. Franck, di beyanek xwe de got ku dibê hukûmeta Swêd, Koma Miletan û Konseya Ewropa ji bo multeciyan Kurd bi hev re hin gavan bavêjin. Di beyana xwe de H. G. Franck wiha dom dîke: "Kampên penaberên Kurd faciayek e û multeci di şertên wek kampên êsîran de dijîn. Kampa ku rewşa wê herî xirab e, ya Mûşê ye, ku 8000 kes tê de dimînin. Çarhawêlî kampê bi tîlan hatiye girtin û her tim di bin çavdêriya notirvanên çekdar de ye." H. G. Franck di dawîya beyana xwe de bi hêrs dibêje ku, pêwîst e ku kamp bên girtin.

Li ser rewşa kampên Kurdîstanê nivîsek Parlamen-



H. G. Franck: "Kampên penaberên Kurd faciayek e" (Foto: G. Kristiansen)

tera Folk Partî (Partiya Gel) Maria Leissner di quncikê "Ramanên Ramenwêran" de em diweşînin. Di vê nivîsa M. Leissner de meriv hovîtî û dijmintiya hukûmeta Tirk bi hawakî baş

dibîne. Ku di dema rêketinê de pêşmergeyek ji M. Lassner re dibêje: "Behsa me bike. Bike ku bira hemû dînya bi qedera me bihese."

Swêd:

Kongra 9-em a Federasyonê


Federasyona Komelên Kurdîstanê li Swêdê di 11 û 12'ê Sibatê de kongreya xwe ya 9-em çêkir. Di kongrê de ji 23'ê komelên endam ên Federasyonê 89 nûner beşdar bûn.

Kongre dût û dirêj li ser kar û barê xwe yê di navbera herdu kongran de sekinî û hin qerar hatin girtin.

Di Kongrê de berpirsiyarên Partiya Sosyal Demokrat, Partiya Gel, Partiya Keskan, Wezaretê Biyaniyan, Rêxistina Parastina Zarokan, Komîta Swêdî ji bo Mafê Kurdan, Federasyona Yunan û Yûgoslavî hazir bûn û piştigiriya xwe ya bi gelê Kurd re anîn zimên. Axaftina nûnerê Partiya Gel Maria Leiss-

ner balkêş bû. Ew bi Komîta Parlamenterên Swêdî re berê bi demekê çûbû Kurdîstanê û li kampên multeciyan Kurd geriyabû.

Piştî hîlbijartina organên Federasyonê, Kongre bi marşa mili "Ey Raqib" qediya.



Bîstek ji Kongra Federasyonê (Foto: Armanç)

Çalakî ji bo qedexkirina çekên kîmyayî û bîyolojîk

"Komîta Zanistî Ji Bo Qedexkirina Çekên Kîmyayî û Bîyolojîk" li Atînayê li dijî çekên kîmyayî derket.

Ji alî 30 rêxistin û Buroya Netewên Yekbûyî bi navê "Komîta Zanistî Ji Bo Qedexkirina Çekên Kîmyayî û Bîyolojîk" li Atînayê çalakî pêk anîn. Di wan çalakîyan de Komîta Tevgera Rizgariya Kurdîstan (TEVGER)ê ya Yunanîstanê ji ci girt. Vê çalakîyê di 23'ê Çilayê Paşin de destpêkir û 8 roj ajot.

Roja yekem a çalakîyan li Unîversîta Atînayê ji alî Komîte civînek çêbû û Komîta Tevgera Rizgariya Kurdîstan ji di unîversîte de li ser qetliama Helepçê raxistinek vekir. Bi beşdarbûna kitleyek mezin berpirsiyarê Buroya Netewên Yekbûyî û serokên

Kîmyagerên Yunanîstanê axaftin.

Di rojên din de ji gelek pispor, profesor, berpirsiyarên rêxistinên mafê insani li ser çekên kîmyayî û bîyolojîkî axaftin. Ew di axaftinên xwe de li ser zirara çekan sekinîn û qetliama Helepçê anîn zimên.

Li ser navê Komîta Tevgera Rizgariya Kurdîstan a Yunanîstanê C. Xebat axift. Wî di axaftina xwe de got ku pêwîst e ji bo qetliama Helepçê diktatorê Seddam û monopolên ku çekan difroşin wî, bên mahkûmkirin û di vî warî de tedbir bên girtin.

Semînera Yekîtiya Mamosteyên Kurd

Yekîtiya Mamosteyên Kurd di 18 û 19'ê Sibatê de semînerêk pêk anî. Di semînerê de mamosteyên Kurd, çapxane, kovar û rojnamên Kurd ji beşdar bûn.

Li gor rojeva semînerê li ser Alfaba Latîni û problemên wê, zarav û devokên Kurdiya Jorîn (Kurmançî), Kurdiya Xware (Sorani) û Dimilî, ji bo zimanekî yekgirtî, berpirsiyar û erkên mamostan û nivîskaran,

derxistina kovareke zarokan hate rawestandî. Li ser van pirsên jorîn guftûgoyên dirêj hatin kirin.

Yekîtiya Mamosteyan ji bo derxistina kovareke zarokan ji çapxane û kovarên Kurdî alîkarî xwest. Çapxane, rojname û kovarên di civinê de beşdar bûn, her çiqas pêşniyarên konkret neditin jî, lê tewreki pozîtîf nişan dan.

Weşanên Nuh

Dîwana Ruhî

Ev Dîwan ji Helbestên Şêx Abdurehmanê Axtepi pêk tê. Şêx Abdurehman ji gundê Axtepi ku li ser qezaya Çînarê (qezaya Diyarbêkir e) ye. Ew di navbera salên 1850 û 1905'an de jiyaye û vê Dîwanê sala 1876'an de nivîsiye. Dîwan ji 28 beş û 471 beytan pêkhatîye. Bi vê Dîwanê ev cara yekemîn e ku afirandinek Şêx Abdurehman dibe Latîni. Zeynelabidin Kaya û M. Emîn Narozi vê pirtûkê ji tipên Erebi wergerandin Latîni û ji bo hîn baştir bê fêm kirin, ji bejeyên Erebi, Farisi û ji bejeyên Kurdî ku roja îroyîn pîrr nayên bi kar anîn ferhengokek ji amadekirine.

Pirtûk 127 rûpel e û ji aliyê weşanxana Jîna Nû ve hatiye çapkirin. Navnişana xwestinê ev e:

Jîna Nû Förlaget
Box 240 12
750 24 Uppsala/Sweden

Gundikê Dono

Ev roman ji aliyê Mahmut Baksi ve hatiye nivîsin. Mahmut Baksi di vê romana xwe de di şexsiyeta gundên Xerziya de jiyana gundiyan Kurdîstanê, nemaze bi pêşveçûna kapitalîzmê ve guherandinên jiyana rojane ya gundiyan tîne ziman. Mahmut Baksi di vê romana xwe de devoka Xerziyan bi kar anîye.

Pirtûk 107 rûpel e û ji aliyê weşanxana Orfeus ve hatiye çapkirin. Navnişana xwestina pirtûkê ev e:

Orfeus Förlaget
Vanadisvägen 18-2 tr
113 46 Stockholm/Sweden

Êsîrên kampên penaberan

Maria Leissner
parlamentera Swêdî
(Partiya Gel)



Maria Leissner li kampa multeciyan bi pêşmergeyek re (Foto: A. Forsstrom)

Çavê lawikê piçûk hêdî hêdî tîjî hê-sir bûn. Bê deng û bê liv li erdê rûniştibû, nikaribû awirên xwe ji her du fotografên ku di destê wî de bûn birevanda. Çavên wî sortir û sortir bûn. Lika xwe hilkişand û rondik hêdî hêdî hatin xwarê.

Li rex wî, di wî cihê tengok de bavê wî rûniştibû, bi mîmikan ji min re behs dikir ku wê roja qederî, gava hêzên ordiya Iraqê dor li gundê wan girtin û hemû malbatên gund rût û repel beyî ku karibin tiştêkî xwe bi xwe re bibin mecbûr man gund bi cî bihêlin û bi çola kevin.

Behsa wê yekê dikir ku her wê roja agirbirrîn di navbera Îran û Iraqê de pêk hat çawa berê namlûyên tivingan ketin sînga Kurdan. Hukûmeta Iraqê wê tola xwe ji pêşmerge; ji têkoşerên rizgariya Kurdistanê hilaniya ku xwedêgiravî bi Îranê re kar kiribûn. "Hel-lek dawîn" a pîrsa Kurda li Iraqê hat plankirin. Di pê re bombebaranên gazê, êrîşên konvansiyonel, mecbûrkirina surgûnê û qetlîam hatin.

Herêmên Kurdewarî nuha hema hema vala ne

Herêmên Kurdewarî nuha hema hema vala ne. Beratên heywanan çol û beyaran din hinekî xêmin. Gundî yan ji ber gazê mirine yan jî reviyane kampên penaberan ên Tirkîyê û Îranê bi vî hawî ruhê xwe xelas kirine. Hinekan di wextê de xwe negihandin ser hudûdan. Pîrek û zarok li Iraqê di kampên êsîran de ne, bi texmînek xurt zilam hatin qetilkirin, debêje merivê li hemberê min.

Min ji Swêd nameyek tevî hinek pere û xeberên ji heval û xizmên wan bi xwe re biribû. Du fotograf jî tevê kiribûn ji bo jiyana xwe ya Swêd nîşan bidin. Fotografan du zarokên şad, tîr û azad nîşan didan ku li ser mîrgekê bi dê û bavê xwe re dileyistin. Ew, ev fotograf bûn ku lawikê piçûk nikaribû awirên çavê xwe yê bi hêsir jê birevanda. Dibû ku pismam û dotmamên wî yan jî hevalên wî yên zaroktiya gund bûn ji Kurdistanê Iraqê ku nuha bi dê û bavê xwe re di havîngehek Swêdî de di ken û şayiyê de bûn.

Gelo li wan cendirmên çekdar difikirî

Gelo çî difikirî? Gelo li wan cendirmên çekdar difikirî ku bi şev û roj bekişiyê kampê bûn. Gelo li qilqila diya xwe difikirî ku ji bo xuşk û birayên wî yên piçûk germ bigre di van şevên sar ên hişk de qileqilê dikir, yan li min difikirî ku ez di meraqa dayikê de bûm gava wê çewalê birincê vedikişand pêş û diponijî ku wê çawa karibe bes ji birincê û belkî jî hinek nîsk pê re, şivek baş û bi kêr ji heşt zarokên xwe re çêke.

Gelo meraq dikir ku ew bi xwe jî wê carekê bi azayî tevî bavê xwe li ser mîrgekê hêşîn bilize? Gelo loma digiriya ku heta kezeb lê biperite?

Em çûn yek ji wan kampên ku Tirkîyê ji bo 37.000 Kurd amede kiribû ku Kurdên di van kampên de ji ber jenosîda heqîqî ya rejîma Iraqê reviyabûn Tirkîyê. Wek her pênc parlamenterên Swêdî û yekê Danîmarkî ez jî li

kampê bûm ku piştî wan raporên alarma li ser rewşa dijwar a penaberan ketibûn navê lêkolînekê bikim. Tiştê ku me Rojavayiya baş fahm nekiribû, ew bû ku kamp ji yên multeciyan zêdetir kampên êsîran bûn. Tirk bi xwe kêmbûn zêde li wan ciyên ku kamp lê ne, bi Kurdên xwe re di şerekî de ne. Merivê çawa 37.000 Kurdên Iraqê berdana nav milet ku wan ji berê de biryara çekhildanê dabûn da ku ji bo mafên xwe şer bikin.

Têl li dora kampên bi şid qeyd û bendkiribûn ku penaberan li cih zêft dikirin. Gava em di ereba walî ya bi alê xemilandî de, ketin hundurê kampa Mûşê çek bi awakî tehdîtkar li ser singên leşkeran çik bûn. Serma hinarîkên ruyê me gez dikir. Berê bi şevê serma di bin sifrê re gihîştibû 28 derecan. Nuha çend deh derece germtir bû. Kamp li rastek rex destekê hatibû avakirin ku wek berriyekê û hewa wê wek Sîbiryayê bû. Ew 8.500 Kurdên vê kampê berê tu carî sermak wiha nedîtibûn. Xaniyên ku wan zivistana xwe tê de derbas dikirin, gelek sal berê hatibûn gotin ku tede nayê jiyîn.

Ji wan zarok û mezinên ku dor li erebên me girtin koroyek kuxuk û xirixirê pêrgiyî me hat. Gava em ketin hundurê rewîra kampê û me pê li axa wê ya dewisandî kir, doktor qasî bîst pîrek qewirand derva ku zarokên wan li pişt wan daleqiyabûn yan jî rape-likîbûn wan, ji bo ku em karibin bi-axivin.

-Herroj qasî 120 nexweşî tî. Bi kêmasî 70'yên wan newxêşê giran in, pîranî ji ber înfeksiyonên boriya nefesê, carna ji ber îltîhaba pişikê yan jî ji ber hin dijwariyên din, got doktorê gelek ciwan.

Hewesa listikê li ba zarokan nemabû

Li derva min dît ku zarok didin pey me. Ji ber ku di odeka tik û tenê ya aîlan a teng û nikaribûn xwe bi cih bikin, ew her roj, ji sibê heta êvarê li derve li ber sermayê bûn. Kinc lixwekirinên wan qutikên pembo û solên lastîk ên tenik bûn. Ne hewce bû ku meriv bifikirîya ku di kampê de mirina zarokan zêde bû. Bi potînen xwe yên zexm û xwespêçayî ez bi xwe jî piştî çarîkekê cemidim, lingên min qerisîn. Hewesa listikê li ba zarokan nemabû. sekinibûn, hişk destê xwe kiribûn bin çengên xwe yan jî li ser axê bi bêdîlî bi keviran dilistin. Di xeyala min de dayik qîriya: zû bazde hundir, kum bide serê xwe û lepikê xwe tîxe destê xwe. Lê bêguman nikaribûn.

A eşkere hukûmeta Tirk nexwestibû ku organîzasyonên însanî kinc û betaniyan bigihînin kampên. Qet şik tune ye ku ew kesê ku ev biryar dabû, ev keçik nedîtibû ku bi çavên matmayî, ji ber sermê diricîfî di ber tena qutikê xwe yê tenik ê pembo ve bû û bê serpûş.

Min rica kir ku me bibin cem komîta kampê ya Kurdan. Pênc ex-

tiyarên mêvanperwer, li ser rîya bûzgirtî ya ber malê rabûn piya, me silav li hev kir. Bi kurtî, mîa rewş çawa bû? Ma tu endîşe hebûn?

-Na, qet! Em em gelek sipasdarê hukûmeta Tirk in ku em qebûl kirin! Tu tiştêkî ku em qazina ji wan bikin tune. Bi minetdarî serê xwe ber bi berpirsiyariya kampê de hêjandin.

Li kampê du merivan cesaret kiribûn ku gazina ji rewşa kampê bikin. Lê sê roj bûn, ew wenda bûn, polis ew girtibûn beyî ku bêjin ber bi ku ve dibin. Nuha, piştî sê rojan malbatên wan ditirsyan ku ka gelo çî bi serê wan de hat.

Em bi ku de diçûn sîxur li pey me bûn

Em bi ku de diçûn sîxur li pey me bûn ku hin bibin ka çî tî gotin. Ev dibû sebêbê nerihetiyek mezin. Meriv di tîrsê de bûn.

Gelekî wek gelê Kurd û bi taybetî jî gelê Kurd ê Iraqê çawa dikare vî barê dîroka jî şidetê, zilm û zahmetiyên dijwar hilgire? Ew çawa karin her serbilind bimînin? Bersiv ew e ku êdî hudûdek heye ku meriv nikare serê xwe bilind û piştî xwe rast bike. Li kampa Mûşê meriv êdî gihîştine vî hudûdî.

Tirkîyê nahêle ku dinya were kampan

Ev nîv sal e hukûmeta Tirkîyê nahêle ku dinya were kampan û alîkariya penaberan bike.

Ev serê nîv salê ye ku dinya bes bi berpirsiyariya protestokirina bombên gazê û şerê qirkirina Kurdên Kurdistanê Iraqê ku ji alî hukûmeta wan tê kirin xwe tetmîn dike.

Ev serê nîv salê ye ku dinya rê dide ku guftugoyên navbera Tirkîyê û UNHCR(Komsiyona Bilind ji Bo Penaberan a Netewên yekbûyî n.w.) bê netîce bimînin, rê dide ku penaberên Kurd ji bêçareyî bibin qurbana prestîj-kariya Tirkîyê a li ser lihevanîna rewşa "ku bi serê xwe karin serî di rewşê re derxin" û ya "ne xema dinê ye ku alîkariya me bike".

Em Swêdî jî di vî listikê de berpirsiyar in ku bes Kurd qurbanê wê ne, ji ber pasîfiya hukûmeta Swêd.

Zarokê sîsiyan ku ez dixwazim behsa wî bikim, lawikekî piçûk e di kampa Mêrdînê de. Wî hemû tîrs û xofa xwe bi rismekî anî bû ziman. Bi

Dûmahîk r.11

Stiriye me

Lawikê Berrivani

Kurd im lê bi Kurdî napeyivim

Di van heft heyşt salên dawî de gelek kesên ji Kurdistanê Tirkîyê li Ewrûpayê -Bi taybetî jî li Swêdê- fêrî Kurdî bûn, fêrî xwendin û nivîsandina Kurdî bûn. Ev, rastiye berçav e ku meriv pê kêfxweş dibe. Lê belê ev ne temamiya rastiye ye. Li alî din, aliyekî rastiye yê din jî heye ku meriv pê gelekî xemgîn û mutesîr dibe.

Ev aliyê ku meriv pê xemgîn û mutesîr dibe çiyê?

Wek tî zanîn, hin der û dor, hejmarek mezin ya Kurdan tu carî fêrbûna Kurdî bi hawakî ciddî ji xwe re, ji komela xwe re, ji partiya xwe re nekirine problem, siyaseta Kurd û Kurdistanê tim bi Tirkî meşandine. Û divê siyaseta de ji tu kêmasî, tu çewtî nedîtine.

Çend numûne:

Mesela, Kurd e, tî li welatekî Ewrûpayê daxwaza îltîca siyasî bike. Di îfada xwe de bi hawakî kelogirî dibêje, "Li Tirkîyê zimanê me qedexa ye, dewleta Tirk nahêle em bi zimanê xwe bixwînin û bi-nivîsinin." Di qampê de polisê Tirk tune ye û kes zimanê wî qedexa nake. Lê cardin jî bi Tirkî diaxîfe.

Komele ye, li dijî asimilasyonê belavokan belav dîke, agahdariyê dide gelên Ewrûpa, rêxistin û musesên navnetewî; dibêje, "Dewleta Tirk nahêle em bi zimanê xwe bipeyivin". Ji bona vê, piştigiriyê dixwaze. Lê di civînan de zimanê axaftinê Tirkî ye.

Ronakbîr e, li li ser hovîtiya dewleta Tirk meqalan dinivîsîne, programan hazir dîke dişîne ji Koma Miletan re, ji rêxistinên demokratîk ên navnetewî re, di wan programan de li siyaseta hukûmeta Tirk a asimilasyonîst rexne digre, ji wan rêxistinên navnetewî alîkariyê dixwaze. Lê ew bi xwe di piratîkê de xwe û zarokên xwe asimîle dîke, bi heval û hogirên xwe re bi Tirkî diaxîfe.

Ji bo "pêşketina" kultur û zimanê Kurdî rojname, ya jî kovareke bi Kurdî- Ya jî bi Kurdî û Tirkî-derdixê, tî de bi dirêjayî qala girîngiya axaftina Kurdî dîke, di vî warî de li xelkê şîretan dîke. Lê di civînan redaksiyonê de zimanê axaftinê Tirkî ye.

Belavokê belav dîke, ya jî di kovar û rojnamê de pesnê girtiyên ku dixwazin di mahkeman de xwe bi zimanê diya xwe biparêzin, dide, dîr û dirêj qala qehremanî û mîraniya wan dîke. Ji bo piştigirîya bi wan re ji dinyayê alîkariyê dixwaze. Lê ew bi xwe, li Ewrûpayê bi qasî girtiyên zindana Diyarbekir "qehremaniyê" nake. Heger bi Kurdî zanibe napeyive, heger nizanibe, fêr nabe, zarokên xwe fêr nake.

Mamostê Kurdî ye, li ser girîngiya fêrbûna Kurdî, ji alî pedagojîk, psikolojîk û siyasî ve meqalan dinivîse, di vî warî de rexne li hukûmeta Swêd digre, mudaxelayên Tirkîyê protesto dîke. Lê bi zarokên xwe re bi Tirkî dipeyive, wan fêrî Kurdî nake.

Li ew welatê ku di meketban de mafê xwendina Kurdî lê tune ye ji bo sitendina vî mafî tîkoşîne dide, îmzan berev dîke. Lê di mala xwe de, di komela xwe de ew bi xwe vî heqî bi cî nayne.

Serokê hêzekê ya jî yê partiyekê ye, dibêje ezê seroktiya Kurda bikim, Kurdistanê rizgar bikim. Bi gotinê, li dijî asimilasyonê qiyametê radike, nivîsên wisa dinivîse ku çavê meriv tîje hêsir dibe. Lê ew bi xwe, xwe ji asimilasyonê xelas nake. Bêyî ku zimanê miletekî bizanibe dixwaze wî miletî xelas bike. Ku em dizanin hinek kesên Ewrûpî bîyî ku iddiyayek wan a wisa mezin hebe cardin jî Kurdî fêr dibin.

Partî ye, di programa xwe de dibêje ezê Kurdistanê xelas bikim û Kurdî bikim zimanê resmî. Lê kovara xwe ya komîta merkezi bi Tirkî derdixê, hemû civîn û kongra xwe bi Tirkî çêdîke. Bi kurtayî, hemû literatûra partiya wî bi Tirkî ye. Lê vî rewşa xwe ya

Dûmahîk r.9

Lêkolîn

Pêşdaçûyina Kurdzaniyê li Ewrûpa*

Rohat

Ev dused sal e, Rohilatzan, zane, pispor, gerok û Kurdzanên Ewrûpî bi ziman, edebiyat, dîrok û etnografiya Kurdan ve mijûl bûne, bi sedan berhem û afirandinên gelek kêrhatî nivîsîne. Bi taybetî bersîva pîrsa "Kurd kî ne?" ew gelekî mijûl kirine. Piraniya wan çûne Kurdistanê, bi mehan, bi salan li Kurdistanê mane. Di nav vê dused saliya buhurî de, Ewrûpa, bûye navçeke Kurdzaniyê, yeke here kevn.

Berê li Ewrûpa hejmara Kurdan pîrr kêrhatî bû, hew çend kes bûn. Piştî gelek salan hejmara Kurdên li Ewrûpa her çû zêde bû, bi vê prosesê ve girêdayî, Kurdan bi xwe jî dest pê kirin bi hebûna xwe ve mijûl bûn. Di nav Kurdan de jî Kurdzan derketin, pêwendiyên wan û zaneyên biyanî hêdî hêdî xurt bûn.

Ji bo fêrbûna serpehatiya pêşketina Kurdzaniyê, giringiya van rojên bihûrî gelek mezin e. Pêşdaçûyîn bi xwe, ji bend û pêwendiyên navbera **duh-îro-sibê** pêk tê.

Piştî şerê Îran-Iraqê, di sala 1979'an de û hatina cûntaya leşkerî li Tirkîyê di sala 1980, hejmara Kurdên li Ewrûpa ji nişkê va zêde bûn. Ji ber dijwariyên li welêt, bi hezaran neçar bûn, hatin derketin van welatên Ewrûpayê. Di nav van Kurdên ku ji welat durtketî de, komeke mezin, multeciyan politikîk pêk anî. Jiyîna van Kurdan êdî deh saliya xwe tijî dike. Berî van salan li Ewrûpa, ji ber sedemên aborî bi hezaran Kurd, bi taybetî ji Kurdistana Tirkîyê, hê di salên 1960'an de hatibûn welatên Ewrûpa. Ji aliyê din, ji bo xwendina bilind, hejmara xwendekarên Kurd jî, di nav van salan de zêdetir dibûn. Di rojên îroyîn de, li her welatekî Ewrûpa, "**Komên Kurdan**", "**Cimaetên Kurd**" an jî "**Taxên Kurdan**" peyda bûne. Kurd, ji ber vê zêdebûna xwe, îro li Ewrûpayê, wek Grêkiyan (Yunaniyan), Yugoslavan û Tirkan "**Kemaniyên Mezin**" tîr hesibandin. Hejmara Kurdên li Ewrûpa dijîn, îro ji 500.000 kesî derbaz bûye. Bi gotineke din, hejmara wan ji niv milyonî zêdetir e. Di nav vê hejmarê de, çihê pêşin bi 350.000 kesî ve Almanya Rojava digre. Tenê li bajarê Berlîna Rojava îro nêzikî 30.000 Kurd dijîn. Di nav van hejmaran de, ji hemû parçeyên Kurdistanê Kurd hene. Di van salan de, bi taybetî, ji ber zordestiyên olî(dînî), li Almanya Federal hejmara Kurdên Êzîdî jî, ji nişkêva zêde bû. Ji derî Almanya Rojava, li Fransê, Ingilterê, Holland, Danîmarka û li Swêdê jî nêzikî sed hezar Kurd dijîn. Di nav Kurdên li Ewrûpa de, nişkeke ku qet Kurdistan nedîditiye, nişkeke nuh, li Ewrûpa mezin dibe. Ew di nav çandeke(kultur) pirnetewî de dimînin.

Ew Kurdên ku ji ber zordestî û êrişên netewî, aborî, çandî, civakî

û politikî, xwe davêjine ber bextê welatên Ewrûpî, tenê li van welatan nefes û bînekê distînin, lê problem û serêşiyên wan xelas nabin, du qat, du car zêde dibin. Di vê rewşa tevlihev û dijwar de, bêguman rîya xelasiyê di zanîna van problemên re derbaz dibe. Bi famdarî nasîn û zanîna van problemên, hingavtin û jêdûrketina probleman hêsantir dike.

Kurdzanî, wek zanistiyekê îro li Ewrûpa û li welatên mayîn bi alkariya sedan Kurdan, Rohilatzan û lêkolînan ve pêşda diçe.**

Di vê çarçevê de, kar û berpirsariya mezin dikeve ser milên zane, pispor û Kurdzanan. Di warê Kurdzaniyê de, lêkolîn û lêgerînên zanistî, pêwîstî û hewcedariya wan herroj zêde dibin. Kurdzanî, warekî xebatên zanistî ye. Li ser koka Kurdan, çanda wan, ziman, edebiyat, dîrok, etnografiya Kurdan û di gelek warên mayîn de, bi destê Kurdzanên Ewrûpî ve heta niha bi sedan xebat hatine çêkirin. "Kurd kî ne?", bersîva vê pîrsê, bi çavekî zanistî, cara pêşin ji aliyê pispor, zane û Kurdzanên Ewrûpî ve hatiye dayîn.

Serboriya Kurdzaniyê

Dîroka van kar û xebata Kurdzanên Ewrûpî, 200 saliya xwe tijî kir. Li ser 200 saliya serboriya Kurdzaniyê, di sala 1987'an de li bajarê Kolnê, bi zimanê Tirkî, bi navê "Kürdoloji Biliminin 200 Yıllık Geçmişi (1787-1987)" kitêbek hat weşandin. Lê pêwîst e, ez li vira diyar bikim wekî, bi taybetî zaneyên Alman û Rûs, di warê pêşketina Kurdzaniyê de, lêkolînen bêhempa û bêpîvan pêk anîne. Ewrûpa, di despêka sedsaliya nozdan de, hêdî hêdî bû navçeke Kurdzaniyê, navçeke bi nav û deng. Li Italyê, M. Garzonî, ji ber xebata xwe ya li ser zimanê Kurdî, li Ewrûpa, wek "**Bavê Kurdzaniyê**" hate binavkirin. Di nava van dused salan de, gelek problemên Kurdzaniyê zelal bûn, gelek babetên ji bo Kurdan tarî bûn, derketin ronahiyê. Li Almanya Federal, karên ku Kurdzanên Alman pêk anîbûn, di nav salên Şerê Cihanê yê Duwemîn de sekinîn, mercên şer navbirik da van xebatan. Lê piştî vî şerî, Kurdzanî li Sovyet bi lez bi pêş ket. Li Lenîngradê û li Erîvanê zanîngehên Kurdzaniyê hatin vekirin. Eva cara yekemîn bû ku di dîroka Kurdzaniyê de diqewimî. Piştî vekirina van zanîngehan, li bajarên Moskov, Tîblîsê, Bakuyê komên Kurdzaniyê saz bûn, Hejmara Kurdzanên Sovyet her çû zêde bûn. Bi zimanên Rûsî, Ermenî, Azerî, Gurcî û Kurdî bi sedan lêkolînen zanistî li ser Kurdan hatin amadekirin. Pêşketina Kurdzaniyê li Sovyet, tesîreke gelek baş li ser xebatên Kurdzaniyê li welatên mayîn hîşt, vê yekê bi taybetî li Iraqê xwe baş nişan da. Pêwendiyên navbera Kurdzanên

Sovyet û yên Iraqê her ku çû xurt bûn.

Kurdzanî bi pêş ket

Piştî Şerê Cihanê yê Duwemîn, di sala 1945'an de, navça Kurdzaniyê li Ewrûpa Rojava bû Fransa. Di nav Kurdzanên Fransayê de, Roger Lescot, Thomas Bois, Joyce Blau karên gelek hêja û kêrhatî di warê Kurdzaniyê de pêk anîn. Hevkarên wan yên bi xwe Kurdan in, wek Kamuran Bedîrxan, Îsmet Şerîf Vanlî, Abdurrahman Qasimlo jî, alkari û piştgirtî mezin nişan dan, wekî ev xebatên destpêkirî, li Fransê pêşta herin.

Hatina bi hezaran Kurdan li Ewrûpa, ji bo Kurdzanên biyanî du îmkânên nuh peyda kirin: a) Yek ji vana, hevdu dîtina Kurdzanên biyanî û yên Kurd hêsantir bû. Di navbera wan de, pêwendî û têkiliyên nêzik hatin pêkanîn, danûstandinên di navbera wan de xurt bûn. Hetanî nuha, Kurdzanên biyanî, alkariyeye mezin nikaribûn ji hevalkarên xwe yên Kurd bigirtana. b) Îmkana din jî, piştî hatina Kurdan a Ewrûpayê, Kurdzanên biyanî hêsantir xwe gîhandin Kurdan, nasiya xwe dane wan, hin îmkânên pratîk peyda bûn, ji bo wana îmkânên lêkolînen dîrok amade bûn. Bi kurtî malzemeyên li ser kar dikirin, hate ber deriyê wan. Tiştêkî pozîtîf jî, ev Kurdên hatin Ewrûpa, çar parçên Kurdistanê temsîl dikin, cudabûnen aborî, çandî û civakî bi xwe re tevayî anîn. Ew, tenê wek "**insanekî**" nehatin, ew, wek "**Kurdekî**" hatin. Ew hatin-çûyîn, ango trafîka nifûsa Kurd, di nav van salên dawîn de, çawa me di despêka gotara xwe de jî got, gelek bi lez û bez bûye. Di sedsaliya me de, teknîk û hacetên înfomasyonê gihîştine rasteke teqînê. Ev guhartin, berpirsariyê û erkên nuh, li pêşiya Kurdzanan pêk tînin. Ev trafîk ne tenê îro, di navbera Kurdan û welatên Ewrûpa de pêk tê, pîrr Kurd jî, diçin kontînentên din. Ji aliyê din, di navbera Kurdên ku li Yekîtiya Sovyet û Kurdên li Ewrûpa dimînin, di van salên dawîn de pêwendiyên baş amade dibin. Di sala 1988'an de, cara yekemîn bû ku sê Kurdzanên Sovyet yên alîm û navdar hatin Ewrûpayê, nasiya xwe dan Kurdên Ewrûpa. Ji vana dîrokzan Manuel Arsenovîç Hasretyan hate Fransê, dîrokzan Şekroyê Xudo û pisporê folklorê Kurd Ordîxanê Cefil hatin Swêdê. Van Kurdzanan, rewşa Kurdên li Ewrûpa bi çavên xwe dîtî, li ser wan agahdar bûn.

Problematîka xebatên Kurdzaniyê

Bi rastî, tu netewek bi milyonan wek Kurdan ewqas di nav gelek welatan de parça û belav nebûye. Ev yeka jî, di warê Kurdzaniyê de hejmara lêkolîn û xebatên li ser Kurdan zêdetir dike, berpirsariyê û erkên nuh datîne pêşiya Kurdzanan. Ev belavbûna Kurdan li ser topa cihanê, rewşa wan ya

aborî, siyasî, civakî û çandî sê faktorên giring pêk anîne. Ji aliyê Kurdzanan de, ev sê faktor, li ser sînoren pîrsên metodên cuda jî, tesîreke mezin dihêlin. Ev belavbûna Kurdan, bala Kurdzanan li ser van hersê faktora dihêlê: **cudabûn, wekhevî, rûberîhevî.** Li ser Kurdan xebatên tîr çêkirin, pêwîst in di tînga xwe de, perspektîfên nuh bistînin, konkret û berbiçav bin. Zane û pisporên li ser Kurdan kar dikin, pêwîst in tenikîyên navbera rewşa Kurd di nav de ne baş bibînin, rewşa wî welatê Kurd lê dimînin, bi kûrayî binasin. Ev belavbûna Kurdan, wek me li jêr jî, bi kurtî analiz kiriye, problematîka xebatên Kurdzaniyê hîn jî zelaltir dide xuyakirin:

* Kurdên ku li çar beşên Kurdistanê dijîn

* Kurdên ku, li welatên Kurdistan bindest kirine, li wir dijîn, wek Kurdên li Tirkîyê, Îranê, Iraqê, Sûriyê

* Kurdên ku, li welatên biyanî dijîn:

-Kurdên li Ewrûpa Rojava dijîn, wek Almanya, Fransa, Swêd...

-Kurdên Lubnan

-Kurdên ku, li kontînentên din dijîn, Awustiralya, Amerîka û Afrîka

* Kurdên ku, li Yekîtiya Sovyet dijîn, wek Ermenîstan, Gurcîstan, Azerbeycan, Qazaxîstan.

Wek tê dîtî, belavbûna Kurdan li ser erdekî gelek fireh pêk hatiye. Ev yeka, kemala cudabûna rewşa Kurdan ya aborî, civakî, politikî û çandî baş nişanî me dide.

Sînoren Kurdzaniyê

Di nav van salên dawîn de, bi destê Kurdan ji bo pêştabirina xebatên Kurdzaniyê çend gav hatin avêtin. Sînoren karên Kurdzaniyê û karên çandî hatin nêzikhevîkirin. Kurdzanî, wek karên akedemîsyena, di zanîngehekê de, bi metodên zanistî ve ajotina lêkolînen li ser Kurdan, ne hate fahmkirinê. Di dawiyê de armancên sazgehên ku hatin sazîkirin, bi armancên zanîngehekê ve tevlihev bûn. Ji aliyê din de yekîtiya di navbera, Kurdzanên biyanî û Kurdan de di bin çatîkê de pêk nehat. Di sala 1983'an de, di pêşengiya çend ronakbîr, nivîskar û Kurdzanan de, li Parisê Enstîtuya Kurdî hat vekirin. Enstîtuyê dest bi weşanên periyodîk kir, bi navê **Hêvî û Studîa Kurdîca** du organ derxist. Di nav rûpelên van weşanan de çend lêkolînen hêja hatin weşandin. Ji aliyê din de, Enstîtuyê li ser Kurdan bîngehên amadekirina pirtukxanekê avêt. Ji Kurdzaniyê zêdetir, karên Enstîtuya Kurdî di warê çanda Kurdî de hatin meşandin. Piştî sazûna Enstîtuya Kurdî li Parisê, li bajarê Bonê li Almanya Federal jî beşeke wê vebû, angorî bernama xwe, vê beşê di warê Kurdzaniyê de, gaveke pêşketî ne avêt. Di sala 1986'an de, li Almanya Federal jî bo vekirina Akademyeye Kurdî hin xebat hatin çêkirin. Li bajarên Dusel-dorfê û Berlînê, van xebatan parçe-parçe ajot, di dawiyê da, du akademyên Kurdî hatin sazîkirin. Yek ji vana Akademya Kurd (**Kurdische Akademie**), yek jî bi navê Akademya Kurdî ya Zanistî û Huner (**Kurdschen Akad-**

emie für Wissenschaft und Kunst). Van her du akademyan jî, heta nuha tu xebateke berbiçav, di warê Kurdzaniyê de pêk ne anîn. Di vê rewşa îroyîn de li Ewrûpa, zanîngeheke ji Kurdzanan pêkhatî, wek hewcedariyeye mezin tê dîtî.

Li ser Kurdan û Kurdistanê li Ewrûpayê pêwîst e, bi navê "**Navça Kurdistanê ya Dokumentasyonê**" navçeyek bê sazîkirin û ev navçe di çarçeva pirtukxanekê de nemîne. Di warê amadekirina navçeyeye wusan de, beşdarbûna kesên zane û teknîkên nûjen, wê rûmeta vê navçe zêdetir bike. Ev navçe, dikare di nav sînoren zanîngeheke Ewrûpî, zanîngeheke Rohilatziyê de jî çih bigre.

Kar û xebat, lêkolîn û lêgerînên li ser Kurdan di rewşa îroyîn de wek ku em dibînin, bi gelek zimanên cuda-cuda ve tîr çêkirin. Ji bo ev karana kêrî gelek mirovan bûn, ji aliyê wan de bîr xwendin û zanîn, pêwîst e, bi kêmanî ji van karana yên bîngehîn bi çend zimanên din bîr wergerandin. Kar û xebatên ku di warê Kurdzaniyê de îro tîr kirin. cama di çarçevê teng de dimînin, zane û xwendekarên ku wî zimanî nizanin, ev xebatana zêde kêrî wan nayên. Pêwîst e, ev dijwariyê ji ortê bê rakirin. Xebatên Kurdzaniyê yên ku îro çê dibin bi çend zimanên biyanî û Kurdî ve tîr weşandin, em wan zimanan li ser çar kategoriya dikarin beş bikin:

- Ingilîzî, Fransî, Almanî
- Rusî, Ermenî, Gurcîkî, Azerî
- Erebî, Farsî, Tirkî
- Kurdî (wek zaravên Kirmancî, Soranî...)

Wek nimûne, di van salên dawîn de, li Ewrûpa di nav rûpelên gelek rojname û kovarên Kurdî de bi zaravê dimilkî gelek tekstên hêja yên folklorîk tîr weşandin, bi naveroka xwe ve zor dewlemend in, bi taybetî ji bo ronîkirina hin pîrsên dîroka Kurdistane, wek çavkaniyên kêrhatî dikarin bîr hesibandin. Lê, hêjabûna van tekstan ji aliyê zane û xwendevanan de zêde nayên zanîn. Bi baweriya min, ev tekstana pêwîst in bîr wergerandinê.

Tunebûna ferhengên

Îro li her welatekî Ewrûpa tunebûna ferhengên **bi du zimanan** (Kurdî û Zimanên Biyanî, wek mîsal ferhengên Kurdî-Swêdî, Swêdî-Kurdî), dijwariyên mezin di karên rojane de pêk tînin. Bi metodên zanistî ve amadekirina van ferhengên îro wek hewcedariyeye mezin tê dîtî. Kurdzanên biyanî û Kurd di vî warî de, pêwîst e ferhengên cuda-cuda amade bikin, van afirandinan, pêwîst e bîr xelafî û bîr xelafî bîr çapkirin.

Di warê materiyalên li ser Kurdan, kêmasîke giring jî, tunebûna ansiklopedîke piçûk, an jî tunebûna pirtûkeke li ber destan e. Çavkaniyeye li ser Kurdan ku, zanînen ansiklopedîk di nav xwe de berev bike, ne tenê ji bo biyaniyan, wusan jî, ji bo Kurdan bi xwe hewcedariyeye bîngehîn e. Wek mîsal, xwendevanekî ku bixwaze li ser bajarê Mahabatê an jî li ser jiyîna Mustafa Barzanî zanînen ansiklopedîk dest bixe, nikare

"Naxwim, venaxwim ji zarokan re bi rê dikim"

Yek ji hevpeyvînên me yên vê hejmarê ne wek yên her gav in. Di vê hevpeyvîna me de nûçegihanê Armançê Gulçin li Stenbolê bi du karkirên Kurd -yek jê zarok e- re hevpeyvîn çêkiriye. Em bi hêviya ku ji xwendevanên me re entresant be wê çap dikin.

"Dema bavê min got ku em ê mala xwe bar bikin û herin li Stenbolê bi cih bibin, gelek kêfa min hatibû. Ma ji vê xweştir tişt hebû? Ezê ji xaniyê wek şikeftê Wêranşahrê xilas bibûma. Min ê nanê firmê bixwara. Dema dibistanê wê çentek û kincên min ên xweşik hebûna. Belê min ev tişt xeyal dikirin.

Ez niha li Stenbolê dijim. Ji bil roja yekşemê ronahiya rojê nabînim. Her roj seet di 7'an de ji malê derdikevim û seet di 10 an jî 11'yê şevê de tême malê. Bavê min li loqantekê garsoniyê dike û pêrê ku ew distîne tenê têra xênî dike. Perên ku ez û kekê xwe qezenc dikin, bi zorê zikê me têr dike. Ez 9 salî me û ev sê sal in ku kar dikim. Di nav van sê salan de min çar nexweşî derbas kirin.

Ba ketiye piyên min û de-ma em çûn ba doktor, doktor bi diya min de hêrs bû û got; "Tu çi jin î, te qet li vî zarokî nenihêrtiye. Di vî zarokî de ba, bronşit, zerik û hwd. nexweşî hene. Di vî umrê xwe yê piçûk de ketiye vî halî! Ev zarok di heyata xwe de îflah nabe!"

Jiyana vî zarokî êşên bi hazaran malbatên Kurd ên ku ji bo kar tîn Stenbolê, tîne zimên. Kurdên ku bi armanca ji bêkarî xilasbûnê berê xwe didin Stenbolê, beryî ku pê bizanibin, dikevin xafikek din. Ew danûstendinên xwe yên li bajar û gundên xwe nikarin li bajarên wek Stenbolê bibînin. Ew nikarin zimanê xwe yê zikmakî bi rehetî bi kar bînin. Ji ber ku ew nikarin bi Tirkî jî bipeyivin ji alî karbidestan ve bi ehmeqî tîn îthamkirin.

Pergalê, dê û bavên muhtacî keda zarokan kiriye. Kapitalîzm tenê bi mêtîna keda dê û bavên namîne, keda zarokên piçûk jî dimêje. Dê û bavên ku di xizaniyê de dijîn pirr caran zor didine zarokên xwe da ku heya ji wan bê zêde pere qezenc bikin. Zarokên ku di vê rewşê de mezin dibin, tu qîmet nadin dê û bavên xwe. Di vê rewşê de nezanî bêexlaqî, bêrûmetî û nexweşînen cinsî di nav van zarokan de "normal" e.

Bi kurtî halê karkirên Kurda ne tu hal e. Rewşa herî xirab a wan e. Bazara ku karkirên Kurda lê kom dibin jê re "Bazara Karkiran" tê gotin, lê me navê "Bazara Karkirên Kurda" lê kiriye. Dema ku mirov dikeve nav van karkiran, dibîne ku ew ji Wanê, Mûşê, Sêrtê, Diyarbekirê Ruhayê û ciyên ditir ên Kurdistanê tîn.

Di atolyeyên çerm, tekstîl û mobilyan de jî rewş eynî ye. Li van deran jî zarok, xort û keç,

mêr û jinên Kurd bi awakî ne insanî tîn xebitandin.

Me nûçevanên xwe şandin nav atolyeyên ku bi piranî Kurd lê kar dikin. Me bi jin û mêrên xwe, bi xort û keçên xwe yên ku her tiştê xwe di van bazaran de difroşin re hevpeyvîn kirin. Em di vê hejmarê de hevpeyvîna ku me bi karkirê însaatê, yê Wanî Y.S. û zarokê karkir B.A. re çêkiriye, pêşkêşî we dikin.

Armanç: Tu bi kerema xwe dikarî hinekî qala xwe bike.

Y.S.: Ez di şantiyê de sewaxçî me. Me di her karê însaatê de xebat kiriye. Ev 11 sal in ku di van karan de dixebitim. Çar zarokên min hene û li gund tu erdê min tune. Ji ber vê yekê jî divê ez werim Stenbolê û kar bikim. Salê du-sê caran diçim gund, dê û bavê xwe, jin û zarokên xwe dibînim. Debara me tenê bi keda min dibe. Ji ber vê yekê jî naxwim, venaxwim ji zarokan re bi rê dikim.

Armanç: Tu mehê çiqasî dişîni malê?

Y.S.: Tenê 60 hezar lîre dişînim. Cixarê nakşînim û naçim qahwê. Her roj nan, firingî, xiyar û pîvaza dixwim. Carna em tevî hevalan xwarinê çêdikin. 200-300 giram goştê kişandî ku em mehê carekê distînin, dixin nav xwarina xwe.

Armanç: Hûn li ku radikevin?

Y.S.: Em di nav însaatan de rûdin û radikevin. Problema herî mezin a kesên wek min, peydakirina ciyê razanê ye. Dema karê te di însaatekê de xilas bû divê tu yeka din bibîni, yan na, tu li derve dimîni.

Armanç: Danûstendina we bi patrona re çawa ye?

Y.S.: Em çiqas bixebitin jî ew ji me gazinan dikin û dixwazin ku em zêdetir bixebitin. Em her sibê seet di 7'an de dest bi kar dikin û di 5.30'ê êvarê de kar berdidin. Îcar ku em bîstekê dereng bikevin, xeberan ji me re dibêjin. Salek berê karkir peyda nedikirin lê îro kesên ku qîma xwe bi wan naynin, ji kar diavêjin.

Armanç: Ma sigorta we heye?

Y.S.: Na, sigorta me tune. Dema tiştêk li me diqewime, me

bi navê yekî din dibin nexweş-xanê.

Armanç: Ev 11 meh in ku te mala xwe, gundê xwe, jin û zarokên xwe nedîtine. Ev 15 sal in ku tu ji malbata xwe dûr î. Ma di navbera te û yekî girtî de ji alî jiyane ve çi ferq heye?

Y.S.: Bi ya min şansê girtî ji yê min çêtir e. Her lêgerîna karekî ji bo min wek mirinê ye. Dema za-rokên min li gund birçî dimînin xew nakeve çavên min. Jina min û zarokên min wê ji min gazinan bikin û bêjin; "Tu mirovekî nekêrhatî yî, tu kar ji te neyê, tu nikarî me xwedî bikî". Ji xwe tu hêviya min ji dahatuya min nema-ye.

Armanç: Em çûn bazara karkiran. Piraniya karkiran Kurd in û karkirên însaatê ne. Bi ya te gelo ji bo çi tim Kurd li van deran dicivin?

Y.S.: Li Stenbolê tenê deriyê karên adî ji me re vekirî ne. Ev bazarên han jî yên karkirên adî ne. Piraniya me ne xwedî pîşekê (sen'etekî) ne. Ji ber ku li welêt tu îmkana me ya xwedî sen'et bûnê tune. Îcar di vî halê me de şansê me tenê di deriyên karên adî de heye. Ji ber vê yekê jî em Kurd bazaran tije dikin.

Armanç: Mirov ji bo dahatuya te dikare çi beje?

Y.S.: Dahatuya me ji me re zêde hatiye dîtin. Heya ku em karê e-meletiyê bikin dahatuyek me he-ye. Lê dema ev kar nekeve destê me dawî li dahatuya me tê. Tu dahatuya kesên ku wek me kar dikin, tune. Dev ji pere civandî-nê berde, car dibe ku gepek nan nakeve devê me. Dema rojiyê piraniya hevalan bi nan û tirî fitara xwe vedikin.

Armanç: Îro çûyîn û hatina te ya welêt bi çiqasî ye?

Y.S.: 60 hezar lîre ye. Di mehekê de bi zorê hewqas pere dikeve destê me. Pirê caran ji dêlva ku ez herim zarokên xwe bibînim, perê rê ji wan re dişînim. Tu nizanî, min çiqas bêriya gundê xwe û zarokên xwe kiriye.

"Em karkirên zarok, me zarotiya xwe jî jibîrkiriye"

Piştî Y.S., me bi Bulent Ayyildiz re hevpeyvîn kir. Ew, ji herkesê ku wî bi kar tîne, ji diya xwe, ji bavê xwe, ji patronê xwe û ji hostayê xwe nefret dike. Bulentê ku ji 6 saliya xwe heya îro wek yekî gihîştî kar kiriye, herçiqas 17 salî be jî wek zarokê 7-8 salî xuya dike. Ew wiha bersîva pîrşên me dide.

Armanç: Ma tu dikarî ji me re qala umrê xwe, warê xwe, karên ku tu dikî, bikî?

B.A.: Ez ji Wanê me. Min di 7 saliya xwe de li atolya mobilyayê dest bi kar kir. Dê û bavê min dixwestin ku ez hînî vî meslegî bibim û tevî birayê xwe atolya mobilyayê vekim. Ji ber vê yekê her çiqas ez ji vî îşî aciz bûbûm jî min domand. Lê piştî ku bavê min li atolyeke mabilyayê milekî xwe winda kir, min û birayê xwe jî dev ji vî karî berda. Me di teks-tûlê de dest bi karê cuda kir û nuha jî em vî karê xwe didomînin.

Armanç: Ez ji te pîrsa sedema nexwendina te nakim. Ez dizanim ku tu jî wek her zarokî dixwazî bixwînî. Lê tu pîr zeif û negihîştî mayî. Gelo tu çawa bi vî halê xwe kar dikî, rojê çend saet dixebitî?

B.A.: Ez her roj seet di 8'an de dest bi karê xwe dikim. Mala me ji ciyê karê min dûr e. Bi şev jî pîranî seet li dor 10-11'an tême malê. Ez hînî bikaranîna makîna dirûtinê bûm. Niha jî wek hostekî bê rawestan kar dikim. Ji bo ku min ji kar navêjin, carna ez heya nivê şevê kar dikim. Dema nexweş dikevim, tu fersend ji min re nîne îstirehet bikim. Ez tim nexweş im, serê min diêşê, îsteha min nîne û bêhna min diçike, tim westiyayî me. Serê sibehan ji xwe ez qet naxwazim rabim.

Wisa bûye ku ez ji her tiştî, ji dê û bavê xwe, ji patron û hosteyên xwe, welhasil ji her kesên ku min îdare dikin, nefret dikim. Ji ber ku ew hemû min bi kar tînin. Di ciyê kar de, ji ber ku ez zarok im, çi karê qirêt (nebaş, pîs) hebin bi min didin kirin. Di ser vê re, karên xwe yên şexsî jî bi min didin kirin. Di firavîne de min ji bo stendina cixarê bi rê dikin. Ji ber ku danûstendina wan kesan bi patron re xweş e, ez jî ji tîrsa vê yekê bi ya wan dikim. Dema ez bi derengî dikevim, lî min dixin. Carna ez, ji ber pîrbûna kar, karên ku didine min tevlihev dikim û ji ber vê yekê jî çêrî min û malbata min dikin û dibêjin; "Ma ne Kurd e, serê wî naxebite".

Îcar ji ber ku ez nikarim bersîva wan bidim, pîr xemgîn dibim, diêşim. Ez pîrî caran di nav livî-nên xwe de nivê şevê digirim.

Armanç: Perê ku dikeve destê te çiqas e, ji van peran çiqasî tu bi xwe xerc dikî?

B.A.: Mehê 70 hezar lîre distînim. Dê û bavê min tenê 5 hezar lîre ji bo heqê rê û xwarina min didine min. Ez ji bo xwe mesrefek taybetî nakim.

Armanç: Xwarina we ya li malê û li ciyê kar çawa ye?

B.A.: Taştîya me penêrê welêt e. Ji ber ku li ciyê kar xwarinê nadine me, ez bi 300 lîreyî nan û helawê distînim û dixwim. Firavîna min her roj ev e. Ne tenê ya min lê zarokên din jî xwe bi nan û helawê yan jî bi nan û penêr tîr dikin. Şîva min jî, ya savar e, ya nîsk e, ya jî kartol e. Em carna perçek mirîşk distînin.

Armanç: Di wexta çûyîn û hatina te ya kar de dema tu zarokên ji xwe re dileyizin dibînî çi tesirê li te dike, gelo tu carna li ser leyistikan xeyalan dikî?

B.A.: Sala pêşî ku min dest bi kar kir, min tim dixwest ku ji van deran herim. Lê ka ezê herim ku? Hêj ez şeş salî bûm me mala xwe bar kir û em hatin Stenbolê. Mirovên me yên ku li Stenbolê dijîyan, dema qala Stenbolê dikirin te digot qey cînet e. Lê belê ez û malbata xwe ji roja ku em hatine û heya îro ji karkirîne pêvc me tu tişt nekiriye. Di ser de jî bavê min milekî xwe winda kir. Niha jî diya min ji her tiştê me dibirre ku xwedê giravî em xwedî xanî bin.

Ez pîr bîriya wan salên ku min li Wanê derbas kirine, dikim. Ez pîr caran xeyala wan rojan dikim. Min bi zarokên mirovên xwe re heta şev tarî dibû dileyist. Apekî min hebû, pîr ji min hez dikir. Min pîr divê ku a niha li ba wî bim. Ez ji Wanê û ji apê xwe pîr hezdikim.

Armanç: Di ciyê kar de pîr zarok hene? Ma piraniya wan Kurd in?

B.A.: Belê piraniya karkiran zarokan in. Di atolya me de 25 karkir dixebitin. Ji van 15 kes, zarokên 8-16 salî ne û me zarotiya xwe ji bîr kiriye. Piraniya karkiran Kurd in. Dema ez hatim Stenbolê min bi Tirkî nizanibû. Karkirên din jî di rewşa min de bûn.

Armanç: Dema tu hatî Stenbolê, te bi Tirkî nizanibû. Gelo tengasiyên ku derdiketin pêş we çi bûn?

B.A.: Ferqa çûyina yekî Tirk Almaniya Rojava û çûyina me ya Stenbolê qet tune. Pîrsa ziman, entegrasyon, naskirina hawirdor biyanîbûn, bêkarî û rewşên giran ên li ciyên kar pîrs û pîrşîrêkên esasî ne. Mirov pîr zor dide xwe da ku van pîrşîrêkan hel bike.

Dema min di atolya mobilyayê de kar dikir, min ji Tirkiya hoste û patronên xwe fêhm nedikir, lêbelê min nedida xuyakirin ku ez fêhm nakim. Ji ber vê yekê jî min carna şaşî dikirin. Îcar hoste û patronên min, min bi ehmeqî îtham dikirin. Bi vê jî ne dima, dema di ciyê kar de nebaşiyek derdiket ên wekî me ku bi Tirkî nizanibûn, sûcdar dibûn.

HUSAM NÎRÎ:

"Xebata hunerî jî şewekî têkoşînê ye"

ARMANC'ê hevpeyvînek bi resamekî xort re çêkir. Resamê Kurd Husam Nîrî gelek resimên baş çêkirine. Ji wan rismên wî hinekan di pêşengehan de cî standine. Bi vê hevpeyvînê re em çend heb ji wan pêşkêşî xwendevanan dîkin.

Armanc: Heval Husam, Gelo çi bû sebeb ku tu bû resam?

H.Nîrî: Herçiqas bi hûrî nikarim destpêka xebata xwe ya ji resim re destnîşan bikim jî belam baş tê bîra min ku rismê min yê yekemîn bû sebebê ku ez di pêşengaha (raxistin, sergî) dibistanê de beşdar nebim, ji ber ku di rismê min de rengdanaweyî, bîrkirname û daxwazên sîstema siyasî ên wê demê nebûn.

Ji bo pêşdeçûna hunerê min, malbata min roleke mezin lîstîye; bi taybetî birayê min ê mezin ku mamoste û nivîskare, tesîrek mezin li min kir. Ji dervî vêya jî ew rewşa ku ez têda bûm û heval û hogirên min yê ronakbîr û demokrasî hiz, hestê hunerê min dewlemendtir kirin.

Piştî temamkirina xwendina navîn, min dixwest xwendina huner a teşkîlî li "Enstîtûya Hunermendî" li Bexdayê bixwînim. Belam rewşa siyasî dest neda. Ji ber vê yekê ez mecbûr mam ku gîmnasîmê (lîse) bixwînim. Di destpêka karê min ê hunerî de tesîra hunermendê İspanî Pablo Pîcaso li min bû. Ev tesîr bi awakî eşkere geha min a li Kurdistanê Sûriyê vekirî xwanê kir.

Wê demê ji ber ku min di cejna mamostan de helbest xwendibû bo cara yekem hatim girtin. Demekê şûnda cardin hatim girtin. Demekê şûnda cardin hatim girtin û bi kefaleta hezar dînarî hatim berdan.

Û cara sêyem jî di sala 1978'an de ez bi hezaran lawên welatparêz yê Iraqî re hatim girtin. Çendekî bi piştî vê girtinê ez terkî welat bûm.

Armanc: Heta nuha qet tu ên raxistin (pêşengeh) te çêbûn, ya na?

H.Nîrî: Di salên 1981-83'an de min sê pêşengehên hunerî li Kurdistanê Sûriyê û li Şamê amade kir. Ez bawerim ku tec-

Pêwistiya têkoşîn û xebata gelê me, bi hunerekî ku nêrîn û armancên xelkê zahmetkêş bîne ziman heye. Her wiha dîsa dibêjim, rola hunerekî xwedî îdeolojî di xebata azadîxwaziyê de ji ti-vingê kêmtir nîne.

rubeyeke serkewtî û nû bû di jiyana gelê min da li vî perçeyî û divê bidim zanîn ku, alîkarî û çavdêriyeke bêsinor ya Partiya Gel û alaqa û yarmetiya gelê min bo min bû. Alaqa gel, ji bo hunermend qabiliyeta ji bo pêkanîna berhemên nû dide.

Armanc: Wek hunermendekî Kurd resamî ji bo te çi ye, tê çi maneyê?

H.Nîrî: Karê hunermendiya min, berê jî û nuha jî beşdarikirineke ji bo xebata azadiya gelê min e. Xebata min ji bo gelê Kurdistanê ye. Herçend beşdarbûna min a di vî warî de hê baş bejn nedabe, hin kul û

kêmasiyên wê hebin jî, ez wan bi du sedema ve girê didim; a yekem ku dereca hunerê min hê nizm e. Û a duyem jî alîkariya kêma hêzên civakî ne. Li gor min xebata hunerî ji şewekî têkoşînê ye. Çewa ku pêşmergetî pêwîstahî bi gullan (derban) heye, huner jî her wisa diviyahiyên wê hene.

Armanc: Pêwendiyên te bi hunermendên Kurd re di çi derecê de ye?

H.Nîrî: Ez bi dilêşî dikarim bibêjim ku pêwendiyên min bi hunermendên Kurd yê li dervî welat kêma in. Sebeb jî ew e ku heta niha tunebûna yekîtiyê ku hemû hunermendên Kurdistanê bi karibin nav de bicî bigrin. Ji bo têkiliyên xwe bi hunermendên Kurd re dey-



tiya huner, ciyekî girîng digre. Pêwistiya têkoşîn û xebata gelê me, bi hunerekî ku nêrîn û armancên xelkê zahmetkêş bîne ziman heye. Her wiha

Li gor min xebata hunerî ji şewekî têkoşînê ye. Çewa ku pêşmergetî pêwîstahî bi gullan (derban) heye, huner jî her wisa diviyahiyên wê hene.


dîsa dibêjim, rola hunerekî xwedî îdeolojî di xebata azadîxwaziyê de ji ti-vingê kêmtir nîne.

Rewşa perçebûna welatê me, jîna giran û dijwar û sargûnkirina bi zorê û şewtandin û talankirina gundên me nabin sebebên pêşveçûna hunerê me. Her çende tesîr lê dibe jî, belam pêşveçûna hunerê Kurdî bi pêşveçûna têkoşîna gelê me yê kedkar ve girêdayî ye.

Her wekî ku em dibînin ku gelek mîletên dinê yê ku ji vî dijwariyê de derbas bûne, lawên wan mîletan, ranewestane;

bo pêkanîna berhemên û tomarkirina rûdayên rojane yê xebata gelê xwe û bo pêşdebirina huner û serbixweyiya gelê xwe ku piştî serxwebûna hunerê wan zêdetir pêşdeçûyê û tesîrek mezin li kultura mîlet kiriye. Gelek welatên sosyalîst û mîletên Asya û Afrika mînakên ji vî tiştî ne. Ji ber vê yekê pêşveçûna hunerê Kurdî bi serkevîna şoreşa gelê me ve girêdayî ye. Belam ji bo ku ev huner di xebata rizgariya gelê me de rolekî girîng bilîze, bilindkirina mistewa hunerê me pêwîste. Divê neyê jibîrkirin û pêwîst e ku hemû hêzên welatparêz û pêşverû yê Kurdistanê alîkariya xwe zêdetir bo huner û hunermendan nîşan bidin. A girîng ew e, ku hewil bidin bo zemînxweşkirina hev-girtineke seranserî ya hunermendên Kurdistanê pêk bê û bo alîkariya maddî û manewî, bo pêkanîna berhemên hunerî yê bi rûmet.

Bo vê hevpeyvînê spasî rojnama Armanc dikim, serfirazî û sekevîne jê re dixwazim. Û hêvîdarim ku dê rojnama Armanc ji nuha pê ve dê hîna jî girîngiyê bide karê hunerê Kurdî.



Çîrok

Mirin çêtir bû

Dema çav bi perixanê û hevala wê ket, ku di kuçê re derbas bûn çûn: tavilê qurta dawîn li çayê xist, rojname ji ser masê girt xist bin çengê xwe, destê xwe avêt berika xwe, deh lira jê derxist dirêji çayger kir, ji çayxanê derket û da peywan. Di fitloneka kuçê de nêzikî li wan kir û got:

- Oxir be ji we re geli xatûnan!

Bi gotina wî re her duyan madê xwe tîrş kirin û awirên tûj danê. Dema ku ew nas kirin Perixanê ke-nek sivik kir û got:

- Bibûre hew mabû ku me çente li serê te dana. Me got belkî berada-yîki bajêr e dev davê me.

- Ma qey ez pîrr girêdayî me?

Tev bi hev re kenîyan û her sêya li gel hev rêya xwe domandin.

Ev serê mehekê bû ku hevdu ne dîtibûn. Her duyan jî dixwestin bi hev re bipeyivin û di wê meha bûri de çî bûye, çî nebûye hevdu haydar bikin û li hal û wextên hev bipirsîn: lê nedibû hevala Perixanê li rex wan bû. Her çiqas ew keçek baş û dilxwaz bû, lê hîna ne wext bû ku gelek tiştên nehênî ji jê ra eşkere kin. Ji ber wê yekê her du jî di qilqilîn.

Piştî ku hevala Perixanê xatir ji wan xwest û çû mal, Perixanê wek ku peyva xwe ji berê de hazîr kiribe:

- Malneketo tu li kuderê yî ev serê mehekê ye wek kevirê ku bavêjin binê birê tu deng û hesa te nedihat?

- Qet me pîrse, Perixan wezîfeke girîng, pêwîst bû derket pêwîst bû biçûma, ji ber vê yekê vê carê dereng mam û nehatim dibistanê jî. Ji xwe wer xuyaye ye ku ji nuha û pê ve dê neyê dibistanê jî. Perixanê bi awakî ecêbmayî:

- Seba çî tu dev ji dibisitanê berdidî, tevde isal maye?

- Wîlo li ser nîga nabe, eger karê te tunebe îşev li cîkî em hevdu bibînin, wê çaxê emê têra xwe ji xwer bipeyivin. Dê çêtir be.

- Baş e ji xwe min ji dixwest hînek pîrsan ji te bikim. Îşev li ku derê em hevdu bibînin?

- Seet heftê êvarê li Bexçê Deriyê Çiyê, baş e?

- Baş e.

Xatir ji hev xwestin. Ferhat ket kuçeyek teng û hêdî hêdî jê bi dîr diket. Perixan ji pişt ve lê nêrî, hişê wê çû sê sal berê. Roja di civîneke xwendevanên dibistanê de, di munaqaşekê de ev axaftin kiribû:

- Hevalno berî her tiştî divê em ji bîr nekin ku em li welatekî mêtîngê dijîn. Ev welatê ku em doza wî dikin, wek ku tê zanîn ji sedsalan ve ye hatiye dagirkirin. Ev erdên ku bi salan e dijmin bi nigên xwe dieciqîne, em nikarin di salekê û du salan de şopa wî ji van erdan paqij bikin. Ji ber vê yekê ji me re li ser himê zanyariyê xebatek dîr û dirêj divê. Dijminê me xurt e û rêya me dirêj e, tije zor û zahmetî ne. Divê em li doza xwe bi çavê karên rojane nenêrin...

Ew peyvên bijarte û axaftina bi

xwe bawer, Perixanê xistibû bin tesîrek mezin. Ji xwe ji berê de wê jî ev raman diparast, lê nexasim peyvên di ew civînê de wê zêdetir bi dozê ve girê da bû. Piştî civînê çend roja bi rîya hevaleyê, wê û Ferhat hevdu nas kiribûn. Ferhat ne bi tenê di civînan de peyvên xweş dikir: di hemû beşên jîyanê de jî xortek dilsoz û fedakar bû. Hevalê havelê xwe û dijminê neyarê xwe bû. Ji alî hemû xwendevanan de dihat hezkirin. Nemaze Perixanê ji her kesî zêdetir jê hez dikir. Û wî jî bi wî rengî ji Perixanê hez kiribû. Heta qewlê zewacê jî dabûn hev. Piştî qedandina unîversîtê dê bize-wiciyana, ji xwe pîrr nemabû, ev sala dawîn bû.

Bi hênkayîya êvarê re mirovan weke morîstankê bajar dagirtibûn. Yê bi destên zarokên xwe girtibûn hûr hûr bi bihna fireh gera xwe dikirin, yê karê xwe qedandibûn ji bo gavek berî gavekê bigihîjin mala xwe dilezandin, yê li çayxana rûniştibûn bi dengên bilind laqirdî dikirin û dikenîyan. Bi kurtayî di rojek buharê de jî yanek boşahî ya bajarî bû.

Kêfa Perixanê li cî bû. Cilên xwe yê nû li xwe kir, porê xwe şeh kir, rakir çentê xwe û ji mal derket berê xwe da Deriyê Çiyê...Li ber deriyê bexçe sekîni û çavên xwe li nav bexçe gerand. Ferhat di qozîya bexçe de li bin darekê rûniştibû, şewqa elektirîkan bi zor cihê wî rohnî dikir. Ferhat ji ber ku çav li rîya Perixanê bû bi hatina wê re ew dît, bi rûkî bişîrî serê xwe jê re hejand. Perixanê piştî ku ew dît rast lezand cem. Ferhat ji ber rabû destê wê guvaşt, cî şanî wê kir û piştî ku rûniştin jê persî:

- Çewanî baş î, deng û bahs çî hene?

Perixanê bi lomekarî:

- Çî başbûn çî deng û bahs malava tu bûyi weka heyva binê ewr; geh xwanê dibî, geh wenda dibî. Vê carê ku hînek dereng ketî: hew mabû me sêroka te belav bikira. Carna min ji xwe re digot "Ev mirov yan li deverêkê hatiye girtin, yan jî hatiye kuştin" Ji tîrsa min newêribû ji kesî jî pîrs bikira.

Ferhat kenîya, destên wê kir nav destên xwe û gotê:

- Qe meraq meke, ez heft ruhî me. Ma ev cara çenda ye, ez ji mirinê xelas dibim, Ma nayê bîra te....? Lê dizanî heta em li ser vê rêyê bin emê li gelek meriv li korka naalîqe û keleman bialîqin. Dibe rojekê em bi kelemekê de ji herin. Ji xwe ev e; yan dibê em dev jê berdîn, yan jî evan tiştan ji xwe re bihesibîne. Ji ber ku dev jê berdîn nîne em bîmrîn jî ev e û bîmrîn jî ev e.

Perixan bi henekî:

- Devê xwe ji xêrê re veke lo, qala tiştên xweş bike, me ji berê de xwe ji van zahmetîyan re amade kirîye. Paşê li dora xwe nêrî û got: hînek hêdî bipeyive, heyran dengê te diçe ha dera han.

Ferhat vêcarê bi dengêkî nîzm

weke ku mîzgîniyekê bidê, bi ken li nav çavên wê nêrî û gotê:

- Min ji te re xeberek baş aniye: Hevalan qarar stendine ku ji niha pêve dê xebatek hîn xurttir bê kirin û di nav vê xebata nû de têra min û te jî wezîfe hene.

- Siheta te xweş lo. Bi rastî jî divê wîlo be. Ma tu rewşa millet nabîni? Êdî jîyan bûye jahr. Mala xelkê xera bûye. Yê ji kar tîn avêtin, yê tîn kuştin, yê tîn birçî û perişan dimînin û li hember van tu libat tune. Ji tîrsa polis û cendirman êdî xewê şevan li xelkê heram bûye. Ma tu bala xwe nadiyê: di malan de, di qahwexanan de, û heta di meşa li sükê de jî her kes ji xwe ditirse. Bêbawerî û bê çaretîyeke mezin ketiye nava millet. Êdî mirov nikare navê şoreşgeriyê jî hilde. Tu li ba kîjan kesî qala şoreşgeriyê dikî hema pêre radpelikin ser çavê mirov û dibêjin: "De herin karê xwe. Me we hûn di rojên xweş de jî û reş de jî dîtîn. Di rojên xweş de bi navê ku emê welat rizgarkin û karker û gundiyan ji bin kedxurî û talana axa û patrona aza kin; hûn xwe bi xwe ketibûn pêxîla hev û we bi dehan mirov ji hev dikuşt û dijmin jî li we temaşe dikir. Piştî ku eskeran dewlet girtin destê xwe, weka pezê gur têkeve nav, terq li we ket, serê wê çû li Erebiştana, li Ewrûpayan derket. Şêx Seîd binin bîra xwe ku nivê xelkê Kurdistanê mil dabûyê dîsa ji li ber leşkerên Tirka debar nekir. Vêca bi vî halê xwe hûnê welatekî xelas kin.

Bi destê rastê porê ku ketibû nav çavên wê bi dawiyê de şikand û domand:

- Bi rastî jî gili û gazinên millet li cî ne. Ma piştî serkirdayetîya faşî, di nav hêzên şoreşger de tu berbihevda bûn çêbû ne? Na. Çiqas dere veqetandin û belavbûn zêde dibe. Û tu jî kê jî pîrs dikî dibêjin: "Ji bo sazkirina yekîtiyekê an cepheyekê em her dem amade ne". Yanî bi rastî her tişt bi deva xweş tê gotin û tu tiştêk ber bi çav nayê kirin.

Ferhat bi şelek ku gotinên wê rast bibîne serê xwe hejand û bi dengêkî qasî ku Perixan bibihîze peyivî:

- Perixan; hemû kul û kêmasiyên di nav tevgeran de, me bi hev re dît û em tê de jîyan û me bi caran aniye zîman. Lê ji niha pê ve em çî bibêjin tewş e, niha em dîsa rabin ew şer û pevçûna ku di navbera tevgeran de bûye vekolin, divê tu berbihevdebûn çênebin. Lê piştî van kirinên ku dijmin tîne serê me divê em ders jê bigrin ku ji niha bi şûn de tiştên wisa nebin.

Piştî ku qederekê bê deng man, Ferhat cixarek pêxist, bi çavên zenûn li Perixanê nêrî û bi melûlî:

- Ev mesela zewaca me jî hînek dirêj bû: Nizanim di vê meselê de dê û bavên te ji bo çî hevqas sar in? Ne dibêjin herê û ne dibêjin na ji ber vê yekê em jî nizanim dê çilo bi-

H. Holî

kin. Wê cara bûri ku ez hatibûm mala we, maliyên we ji min gelek dilxweş xwenê dikirin.

- Bi rastî min tiştêk ji vê pergale fam nekir. Dê û bavê min jî hînek bê sebr in; ji ber ku ez nuxuryê malê me, dixvazin rojekê berî rojekê ez bizewicim. Bavê min ew bû çend car bi ber guhê min dixê. Dibêje: "Kurê min eger maliyên Perixanê dil nekin ezê ji lawê xwe re keça apê te bixwazim te dîtîye weke gurciyekê ye" Îcar tu zanî Perixan weke pêşiyên me gotine "Mirin carek e û zewac carek e" Keça apê min li ba min weke xuşka min e. Yeka delal e jî lê xwîna min lê nakele. Ez û tu eva serê sê sala ne hevaltîya me çêbûye me bi her awayî hevûdu naskirîye, me bi hev re xebat jî kirîye û ramanên me yek in. Ji xwe li bal min di zewacê de hemfikirin ciyê girîng digire. Bi rastî ez naxwazim li ser vê meselê bipeyivim, ji ber ku biryara vî tiştî sê sal berê me bi hev re dabû.

Perixanê peyva xwe bi a wî ve zeliqand û gotê:

- Tu guh medê ev mesele xelas bûye. Vê cara dawîn ku tu hatibûyî mala me, piştî ku tu derketî bavê min wek ku bixwaze ez jî bibihîzim bi diya min re dipeyivî û digot: "Heyran mesela van zaroyan jî hînek dirêj bû bi xêr vê unîversîtê jî xelas bikrana me wan bi serî bikrana. Welehî wexta ku çav bi wan dikevîm dilê min diêşe.

Piştî axaftina Perixanê, ji kêfa çav li Ferhat çirisin, hema hew mabû di nav wê çayxanê de wê himbêz bike. Hema rakir destê wê û ji çayxanê derketin.

Bi meşek giran gerrek dirêj kirin. Û li ser bûyerên dinê û welat û rewşa ku ew tê de bûn û li ser xebata nu ya ku wê bikirana têra xwe peyivîn. Nêzikî qozîya mala Perixanê bûbûn, Ferhat destê xwe dirêjî wê kir û gotê:

- Êdî dereng bû ezê biçim mal, de bi xatirê te, dibe ku heta çend rojan em hevûdu nebînin.

Perixanê wexta ku rahişt destê wî, li dora xwe nêrî dît ku sape ye, êdî xwe negirt, hema xwe avêt himbêza wî û destê xwe li nav piştê şidand û gotê:

- Nizanim çima? Hema dixwazim her tim li cem te bim. Roja ku te nebînim weke gêja me.

Ferhat bi henûntî destê xwe li nav porê wê gerand û bi henekî gotê:

- Qet meraq meke te hew nêrî rojek hat ku em ji hev kerixî ne jî.

- Qet bawer nakim.

* * *

Dûmahîk di hejmara bê de

ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar: Hesên Mizgîn

Îro li Japonyayê keçikeke nûbûyî 81.6 sal û lawikekî nûbûyî 75.6 sal dikarin bijîn. Ev reqemên han niha li dinê jî alî dirêjbûna jiyana mirov de rekor in.

Jin 4 caran jî mêran zêdetir hêsirên çawa dibarînin. Sedemê vê yekê hormona prolaktîn e. Jin hormona prolaktînê jî mêran zêdetir çêdikin. Heya niha wisa dihat zanîn ku prolaktîn hormona çêkirina şîr e. Lêbelê prolaktîn hêsirên çavan jî zêde dike. Li gor aliman zêdebûna hêsirên çavan piştî ku keç dibin jin dest pê dike.

Lêkolînerên Brîtanî nuha dixwazin babetekî genim biafirînin. Wek tê zanîn genim di erdên bi xwê de şîn nabe. Lêkolînerên Brîtanî niha dixwazin hêşinayîyek bi navê AGROPYRAN JUNCEUM bi genim bitamînin. Ji ber ku ev hêşinayî di erdên bi xwê de jî şîn dibe. Eger lêkolînerên Brîtanî bi ser kevin wê piraniya welatên ku têra xwe genim naçînin bikaribin têra xwe genim biçînin.

Dema mirov qala Parisê dike jê şik tune ye ku Qûleya Eyfel tê bira mirov. Pîlana Eyfel jî alî Gustave Eiffel hate çêkirin, lê 40 mîmarên din jî tevî Gustave Eiffel di avakirina Eyfelê de beşdar bûn. Eyfel jî 15000 perçeyên hesin ava bûye. Bilindiya wê 300 mîtro ye lê tevî antênên li ser, digihîje 321 mîtro. Di rojêke taverojê de jî serê Eyfelê mirov dikare 80 km firehî temase bike. Di salkekê de 2 milyon insan tî ziyareta Eyfelê.

ilim û teknîk

Satelît wê jî nuha pê ve karê casûsan bikin

Peymana çekdaxistinê ya di navbera DYA (Dewletên Yekbûyî yê Amerîka) û YKSS (Yekîtiya Komarên Sosyalist ên Sovyetî)

de karûbarê casûsiya navnetewî bi temamî guherand. Ji nuha pê ve casûs dikarin berçavkên xwe yê reş û riyên xwe yê derewîn deynin alîkî. Bi teknîka gelek pêşdeçûyî, bêtî ku mirov jê aghdar bibe her du dewlet jî dikarin hevûdu kontrol bikin.

Ê ku peyman çekdaxistinê ya di navbera DYA û YKSS de kontrol bike ne KGB û ne jî CIA ye. Vî karê han wê satelîtên îstîxbaratê bikin.

Teknîka satelîtê bi rastî hewqas pêş de çûye ku her du dewlet jî, bêtî ku jî hevûdu aghdar bibin, dikarin hevûdu kontrol bikin. Satelît gelek sivik dikarin rîya xwe biguherin û jî ber materyaleke sentetîk radar nîkarin wan qeyd bikin.

Di peyman çekdaxistinê ya dirokî de îmhakirina 350 fûzeyên atomî yê nivmenzîl ên DYA û 1500 jî yê YKSS hene. Peyman bi xwe li gor aghdariyên ku satelîtê dane hev hatiye îmkirin. Lê heya sala 2000'an dema peyman hew derbas be, dê herdu alî bi teknîka gelek pêşde çûyî bikeribin hevûdu kontrol bikin.

Di teknîka nû de DYA pêşdetir e

Teknîka satelîtê bi taybetî di çar alîyan de gelek pêşde çûye û dikare aghdariyên pêdivî bicivîne.

A yekemîn, mirov dikare bêtî ku aliyê din pê aghdar bibe, rîya satelîtê biguherîne û îmkana hesabkirina dema firîna satelîtê û çiyê ku wê di ser re bifire her ne mimkun e.

Bi taybetî Amerîkî di vî teknîkê de gelek pêşde çûne. Satelîtê KH-11 ku giraniya wan jî 10 tonan zêdetir e, bi salan e ku manevrayên xwe dikin û jî ser herêmên tespîtîkirî difirin. Lê dema mirov rîya satelîtê diguherîne şewata wan kêr dibe û jî ber vî yekê jî umrê satelîtê jî kêr dibe. Satelîtê 2-3 sal dixebite. Di sala 1989'an de dê satelîta KH-12 bête xebitandin. KH-12 satelîta îstîxbaratê ye û giraniya wê 13 ton e. Dema şewata wê biqede wê bikaribin cardin tije bikin. Du astronot dê bi fûzeyê biçin asîmana, jî fûzeyê derkevin der û borîya tanka fûzeyê xwe wê bi tanka KH-12 ve girêdin. Piştî re jî wê tanka KH-12 bi hudrazîn (şewata KH-12) tije bikin û KH-12 bi vî awayî wê karûbarê xwe bidomîne.

Sovyetî jî satelîtê ku dikarin pê manevra bikin ceribandine. Ew wek Amerîka pêşde neçûne, lê ev jî bo wan ne problem e. Sovyetî jî çiyê satelîtê gelek satelîtê dişînin asîmana û bi vî awayî dikarin manevrayên wiha bikin ku kes nikare bê aghdar bibe.

Sovyetî di salekê de qasî 30-40 satelît dişînin asîmana, lê Amerîka tenê 1-2 satelîtê dişîne. Ji vî yekê jî jî bo Amerîka pir girîng e ku satelîtê wan bikaribin manevra bikin. Her du alî jî dikarin bêtî ku jî hev aghdar bibin, satelîtê xwe jî ser hin herêman bifirînin.

A duyemîn; teknîka nû ya satelîta, îmkaneke nû tîne holê. Piştî 2-3 salên din herdu alî jî bêtî ku yê li hember pê bizanibe wê li ser wî aghdarî bicivîne.

Satelîtê ku niha tî bikar anîn, bi rehetî jî alî radaran ve tî kifş kirin. Ev satelît jî metal hatine avakirin û baskên wan ên mezin hene. Lê niha teknîka nû bi navê "stealth teknolojî" dikeve karûbarê asîman. Vî teknîka ha jî alî Amerîka ve ev 2-3 sal in ku tê ceribandîn. Mirov bi saya vî teknîkê dikare teyarên ku jî alî radaran nayên kifş kirin ava bike. Ji bo vî jî materyaleke taybetî ya jî sentetîk ku dikare pêlên radara paşde bişîne tê bi kar anîn. Satelîtê ku bi teknîka "stealthteknolojî" bêtî avakirin dê hem piçûk bin hem jî gilover û bê bask bin. Di çiyê baskan de ku wek panêla rojê dihatin bi kar anîn dê generatorên atomî yê piçûk bête bi çî kirin.

Bi saya satelîtê stealth (stîld) hewcedariya teftîşê jî holê radike. Ji ber ku ev satelît bi kêrhatiya xwe ya manevrayê karê teftîşê dikin.

Lê bi taybetî Amerîka divê satelîtê xwe jî nişkave bifirîne û ev tişt jî bo Amerîka pir girîng e, ji ber ku tenê du satelîtê wan ên ajanî hene. Ji tecrûbeyên ku hatine bi dest xistin xuya dibe ku Sovyetî di dema firîna satelîtê KH de, bi zanebûn tank, teyare, noqar û radarên xwe naceribîne.

Ji bo ku mirov bikaribe jî asîman kontrolê bi rêk û pêk bike, divê mirov satelîtê jî nişka ve bifirîne. Carna firîna satelîtê tu netîce nadin. Ev jî girêdayî ewrên pir qalind ewrên pir qalind in. Dema yê li hember manevrayê xwe di bin ewrên qalind de çêdike satelît nikarin resim bikînin.

Komputer derdixe ortê ku kî zaftir dizane

Ê sêyemîn; bi teknîka nû mirov dikare bi rehetî hedefên sexte (derewîn) tesbît bike. Ev jî bi saya dedektorên CCD tê kirin. Dedektorên CCD jî çîpên pelikên (Chip) sîlikên pêk tî û nêzî sentîmetreyek fireh in û tîde bi sedhezaran perçên resim hene ku jî van perçan re pîksels (pixels) tê gotin.

Dema fototîrêj li CCD'ê dikevin, elektronên ku di mejiyê her pîkselsê de hene, serbest dibin û her yek jî van elektronan bi serê xwe bi elektrîkê tije dibe û ev elektrîk qasî tîrêjên ku dikeve ser elektrona ye. Elektrîka ku di her pîkselsê de tije dibe, bi rîya elektrîkê tê xwendin û jî bo mezînahiya elektrîkê jî hejmaran kodek tê danîn. Ev kodên jî hejmaran di komputerê de tî xebitandin û bi vî awayî jî mirov dikare resman derxe holê.

Hem Amerîka û hem jî Sovyet vî teknîka nû bi kar tînin. Di vir de berhevdana Amerîka û Sovyetê ne li ser dedektoran bi xwe ye, lê li ser xwendina resman a li komputerê ye.

**Ji ILLUSTRERAD VETENSKAP,
hejmar: 8, Tebax 1988**

Kurd im lê bi Kurdî...

Destpêk r.4

trajî-komîk jî xwe re nake problem, nake rojeva xwe, di organên xwe de tu carî bi hawakî ciddî li ser munaqeshe nake, tu biryaran nagre.

Ez baş dizanim, di dema xwendina vî nivîse de wê sitrî tîke-destê hin kesan, wê biqehêrin û jî xwe re hin sebeb û îzahên "objektîf" bibînin. Lê bi raya min, tu sebeb, tu îzah û tu dijwarî nikare heq bide wan. Mesele gelek vekirîye, heger em Kurd û ronakbîrên Kurd in, heger em mamostê Kurdî ne, heger em komele, rojname, kovar û partiyên Kurdî ne, dibê em bi zimanê xwe biaxifin, bixwînin û binivîsin. Dibê civînen me, kongrên me, weşanên me bi Kurdî bin. Ez nabêjim em bi Tirkî neaxifin, nenivîsin. Na, heger îmkane me hebin em bi Tirkî jî û bi zimanên din jî weşanan derxin.

Em dibînin li welêt dijmin çawa bi pîlan û bi program dixwaze miletê me bihelîne. Li hember vî, silogana "Devleta Tirk me asîmîle dike, bimre asîmlasyon" ne bes e. Dibê em jî bi zanebûn bi qerardarî û bi program diwarekî li pêş vî lehiya asîmlasyonê lêkin; dixwaze bira ev diwar jî "xilika" be.

Heger îro jî % 90-95'ê siyasiyên Kurdan bi Kurdî dizanin û cardin dibêjin "Bi Kurdî axaftin û nivîsandin zahmet e" piştî 20-30 salê din çaxa ev hejmar daket jî % 20 û 30'î, a felaketa mezin wê çaxê ye.

Tiştê li ber çava ye, kesê mesele ciddî girtiye fêr bûye. Rêxistina mesele ciddî girtiye di hemû organên xwe de bi Kurdî peyiviye, hemû nivîs û weşanên xwe bi Kurdî kirîye. Îcar na emê vî zimanî di her warê jiyane de neaxifin wê çaxê ev tîkoşîn jî bo çî ye; hema emê bibêjin, "Ji Rojhilat re av, rê, elektrîk û fabrîqe", çima vî miletî zêde bi xwe re perîşan bikin!

Hindik-Rindik

DEVE

Du kesên vîrek kişiyabûn ber derewan derew dikirin. Yekî:

- Do êvarî burûskekê lê xist, hey hewar. Her der bû wek ronkayîya royê. Li rex çiyê, bawer bike tam min hezar çeçel jimartin.

Yê din gotin jî dev girt:

- Çaxa burûskê lê xist min li serê çiyê devak dit. Serê xwe dirêj kir jî besta jêrî çiyê av vexwar.

Yê yekem xwe ranegirt:

- De de, devê daxine deştê.

- Tu jî çeçalan daxine heystê.

HEGER DEREW E...

Mustefa İzzet Efendiyê Xettat* merivekî wisa bû ku kêç dikir deve. Rojê jî dostekî xwe re got:

- Şeva çuyin heta sibê rûniştim, min Qur'anek bi temamî nivîsand û danî wira.

Bîstek derbas bû îcar dostê wî dest pê kir:

- Remezana par, jî bo fitarê diçûm Qandilliyê. Di Boxazê (Bosforê, Tengava Stenbolê) de firtoneyek wisa rabû tew qal meke... Pêlan keleka min berberî şerîfeyên minarên keleka bahrê kir. Gava keleka min di nav pêlan de li ba dibû top hatin avêtin, fitar bû. Min jî cixara xwe jî qendilên minaran vexist û fitara xwe vekir.

Mustefa İzet Efendi qirîya got:

- Derew... derew!

- Heger derew e ew Qur'ana te şeva çuyin nivîsî û qedand her du çavên min kor bike.

*xettat: hunermendê destnivîsa wî gelek xweş.

RADYOYÊ GOT

Di sala 1967'an de, di dema şerê Misrê û Îsrail de serokdewletê Misrê gava dibîne ku sîrren leşkerî yê herî bi dizî jî dikevin destê casûsên (sîxurên Îsrail, qîrêrê dide ku civîna wezîran di sengereke binê erdê de çê bibe.

Piştî destpêka civîne bi sê seetan dema jî wezîran yek hêzî ser xwe dike ku biçe daşîrê(tuwaletê), Nasîr deng lê dike, dibê:

- Heta ku civin neqede wê tu kes jî derî dernekeve!

Piştî 6 seetan civin diqede, jî sengerê derdikevin. Heta wê çaxê wezîrê ku xwe ranegirtibû û bi xwe de berda bû, li ber derî pîreka xwe dibîne. Di destê jînekê de kincên paqij...

Jînek dibêje:

- Ji ber ku min bi rewşa te zanî bû li benda te bûm.

- Te çawa karîbû bizanîbiya ku?...

-Radyoya Îsrail got!

Amedekar: Zinarê Xamê

Konferansê Stokholmî û Dimilkî

A. Diljen

13-14-15/1/1989 di bi namê Konferansê Stokholmî ya konferansê bi. Çend welatandê Awrûpa ra bi nameyê çend komelandê Kurdan a tayn delegey ameybî dawetkerdiş. Tayn delegey zî ze "zanayey" ameybî konferans.

Namedê partiyandê Swêdiyan ser o zî çend delegey ameybî.

Konferans di hîrê rojî meselandê Kurdanê teberdê welatî ser o ame qisey kerdiş. Programê konferansî bi nê maddanê cêrênan a amebî viraştiş:

1-Sebebê ameyişê Kurdan bi Awrupa

2-Awrupa di weziyetê macîr, karker, cinî, qeçek û xortanê Kurdan

3-Awrûpa di weziyetê neşriyat, edebiyat û karê kulturî yê Kurdan.

4-Awrupa di weziyetê komelanê Kurdan û meseleyê piya karkerdenî û paştîdayişan.

Bi raştey hazîr kerdişê nê konferansî karêdo erciyaye bi. Na fina verêna ki henday komel û kesê Kurdî yê zanayey yenê pê ser û piya meselanê xo munaqese kenê. Konferansî ra tay netîceyê asayey nêvîjîyê zî, pêser ameyişê henday Kurdan bi seredê xo netîceyêdo rind o.

Mi zî goştareya deleganê konferansî kerd Zekî mi cor di zî va, konferansêdo wina viraştiş karêdo erci-

yaye yo. Qandê coy ez embazanê mesulanê Federasyonêda Kurdan pîroz kena. Labelê tayn kemaney konferansî zî estîbî. Ez do nê kemaneyan ra teniya mesela Dimilkî(Zazakî) ser o vîndera.

Programê konferansî di, Awrupa di raveşiyayişê zîwan û edebiyatê Kurdan zî estîbî. Labelê konferansî di teniya behsê Kurmanckî û Sorankî (Kurdkiya Cêrî û Kurdkiya Corî) ame kerdiş. Verê konferansî tayn kesan rê wezîfe amebî dayiş ki edebiyatê Kurdan ra bahsê letanê Kurmanckî û Sorankî bikerê. Labelê qandê Dimilkî û Hewramankî kesî rê wezîfe niyamebî dayiş. To vatê qey Dimilkî û Hewremankî leteyê Kurdki niyê. Hele Kurdê Iraçî û İrani na mesela rê bol xerib ê. Kurdandê Soranan ra kê zîwanî ser o qisey kerdê, vatê "zîmanî yekgirtû". Labelê dima zî vatê "her dî zaravayên Kurdî yê gewre..." û domnayê.

Konferansî di na mesela ser o Yucel Yeşilgoz, Malmîsanij û Mistefa Duzgunî tayn persî kerdî û waşt ki mesûletaya delegandê konferansî biyarê înan vîrî.

Kurdê Kurdîstanda Tirkîya na mesela zanê çimki pêro miyan dir ê. Qandê coy zî bolê ci vanê "ganî (gerek) ma tedbir bigirê ki Dimilkî (Zazakî) zî biro nûştîş û wendiş". Labelê Kurdanê

Soranan hewna ciddiyetê na mesela û maneyê jûbiyayişê zîwandê Kurdki fam nêkerdo.

Dimilkî letey zîwandê Kurdki yo. Nezdîyê hîrê milyoni Kurdî bi Dimilkî ya qisey kenê. Qandê wendiş û nûştîşê Dimilkî, lazîm o ki verê Dimilîyan Kurmanckî û Soranî tedbir bigirê. No wezîfeyê înan ê birayey o zî.

Qandê ki Kurdê ki Dimilkî qisey kenê, bişê mekteban di qeçekanê xo bi Dimilkî ya bidê wendiş, bişê radyo û televîzyon di qoştareya Dimilkî bikerê, bişê weş zîwanê xo binusê ganî (gerek) nika ra tedbirî bêre girewtîş. Ma zanê, welat di heme babetê Kurdki yasax o. Labelê teber a kes şeno komelan di bi qursê nûştîş û wendişê Dimilkî ya dest pa kero.

Ki Dimilkî mehmeleyê qeçdê dêmarî bivîno, dişmenê Kurdan do na mesela ra faydê bivîne. Ganî her Kurd na mesela ser o panik nêkewo, labelê bi ciddiyet a ser o vîndero. Ki ma Kurdî jewbiyayişê welatê xo, milleta xo wazenê, ganî ma verî jewbiyayişê zîwandê xo biwazê. Ganî ma teniya bi waştîş a zî nêmanê, qandê ci bi militaney a xebatî bikerê. Ki ma zîwanê xo jew nêkerê, ma hewndê şewan di zî welat û milletêda jewbiyaya nêvînenê. □

Şiiranê Usxan'î ra

PUK O, SERD O

Derê Laşî yo, puk o serd o,
Eskerê dewletî dorme ro mi qureto.
Corîniya mi zime wo,
Cêrêniya mi Munzur o.
Nat-dotê mi eskerê dismenî yo.
Mua mi amê ra çimonê mi ver,
Heştîrê mi çimonê mi ra bî ve huskî.

Vore vora, esto xasû.
Xayîn koto ra eskerî ver,
Cayê mi misno ra dismenî.
Az dismen de dan pêro,
Belka kî mireno.
Na roj vîrenê ra,
Na welat de onca çiçeği kenê ra.
Naye mi rê meke xayîn!
Domanê ma tê ri de niyadanê,
Onca ma xo ve xo me.
Nayê mi rê ça kena xayîn?
Az mireno sono,
Vengê mi gosonê to ra nêbirino
Hata merdena to.
Vijdanê to, to rê hêşîrên keno;
Posema bena xayîn.
Nayê mi rê ça kena xayîn?
Kuna ra dismenî ver, ana,
Seweta ponc qurîşê dîna
Welatê xo, milletê xo rosena.
Roje yena tu kî ta ra bar kena.

2.12.1986

DERSİM

Çiqa ke vengê xo mevejê,
Çiqa ke binê bonê xo ra mevejîyê,
Onca to ra pers kenê.
Nîzonenê qelvê to seweta kamî erzeno,
Soluxo ke cêna, seweta kamî cêna.
Domanê derguse ra tersenê.
Binê sewqa de sarê xo mekine!
Tifong kenê ra to serî.
Çiqa ke vazê "Ez Tirk ne",
Çiqa ke xarazê xo bidê,
Kaxitê sarî de qeyd kerdo.
Welat Dersîm o.
Güvenlîrlîk durumu: Şüpheli.
Çike welatê Dersîm de amo dîna.
Güvenlîrlîk durumu: Dedeleri kadar.
Welat: Dersîm.
Kaxita sarî de
Siyah-beyaz bir resim,
Sorarsan memleketi:
Hardê Dersîm.

1986

GENEY

Vizikê Tirkon,
Gureto silê gawon ra
Wenê, wenê, mird nêbenê.
Genê Tirkon,
Gureto ma ra
Gona ma linê, linê, mird nêbenê.

3.5.1984

Gidiyan

Arêkerdox: Malmîsanij

- Dayê, gidîyano, gidîyano*!
Hela mi va derd û kul o bêderman o.
Mala felekê nî(nê) zerîyan o.
Ez nêzano ez se vano,
Ez derdê xwi may xwi rî vano.

- Hela keynê, se biyo, çi biyo?

- Dayê, derdê mi giran o:
Ez veciyawo berreha key datano,
Ez howniyawo çutay rayêrano,
Ne gelan o, ne gîdan o**,
Ha yena zoncay tolazan o.
Ay verên Ziya Begê Baxîncan o,
Ay bîn zî lacê Fata Heydercan o.
Feqet çew derd û kul û meqsedê mi nêzano.
Derd û kulê mi lacê Fata Heydercan o.
Ez nigêno Ziya Begê Baxîncano!
Ez nigêno enî tuywerê Baxîncano!
Ez gêno lacekê Pirancano.
Day, ez howniyawo duzê enî şîqano,
Day, ez howniyawo tuxmê enî şîqano.
Day, wesar qediyawo, aminan o.
Day, yêre wo, rojawan o,
Seyay teluy girewto fekê rayîrano.
Adir bigîro key marday mexmelsipîyano.
Mi mil di bêwey mirjanano,
Mi dest di bêwey bazinano.
Mi poro sîya verra dawo serê kiftano.
Day, ti îznê mi bida ez şono
Çemê Akrag, tarro teze wo.
Hela dayê, gidîyano, gidîyano!
Hela derdo zav o, çew nêzano.
Cêr o veciya yew laceko qol û qut û sîyatalê wo,
Va: "Herê keynê, ti şona ça wo?"
Mi va: "Lacek, ez şono Çemê Akrag tarro teze wo."
Va: "Herê keynê, geyri,
Destê xwi bidî, ma şêrî eno ko ro."
"- Hero lacek, ma şêrî eno ko ro,
Ko rişîşê varanî bido min û to ro."
"- Herê keynê, wa rişîşê varanî bido min û to ro,
Ti şeker niya ez to boro.
De haydê, haydê, zerencay mi!"
Day, mi va ez serey xwi gêno xwi rî şono,
Mi di ez hamewo dewi miyano.
Hela day, mi serey xwi girot û ez rageyraynî.
Hela day, ez dew ra veciyaynî,
Day, mi parçînê rezo xelesnaynî,
Hela, mi serey xwi kerrî ver o naynî,
Mi derdê xwi kerrî rî vaynî.
Kerre derdê mi ver heliyaynî,
Eno dar û ber qaydê mi feqîrî rî kelemiyaynî.
Day wesar qediyawo, aminan o,
Şarê :na bar kerdo, şono koyano.
Ez nêweş o, perîşan o.
Ez xwi ra pey hownêno duzê filhanano
Heta ma kerî yû pesê xwi ronaniyo.
Ez resney xwi gêno xwi rî şono,
Ez nêzano ez se ra şono.
Ez kewta kerran û leman miyano,
Ez şîya lewey Kowlê Kalmusano,
Ez howniyawo lewey Kowlê Teyerano.
Ez ina howniyawo cor di yeno refê keynano,
Ez ina howniyawo cor di yena cerga keynano.
Refê keynanê Xeylancano
Manenî werdekanê golano.
Ez şîya kewta ay keynan miyan o.
Ez 'enê xwi rî derdê xwi vano,
Mi di veciyay çutay cendirmano.
Day, bira ez Tirkî nêzano,
Ez senî cebabê enî tefesan dano?
Leyro, leyro, leyro, luri!
Ez heyranê şardê durî,
Mi çimî kerdî kilway komirî.

* Vatişan gore, yew keyneki na deyirî xo û waştêyê xo ser o veta. Pî û maya keyneki waştî ki yay bidê Ziya Begî. Herçiqas ki Ziya Beg mireyanê Palî ra yew biyo zî keyneki nêwaştî Ziya Begî bigîro. Keyneki wayirê waştî biya. Na deyirî ra fahm beno ki waştêyê yay "Piranic" o.
Mi na deyirî 1975 di fekdê yew dewijê dewa Dêrey ra nuştîbî (Dêrey: yew dewa qezay Piranî ya).

** **gelan:** Na kelîma Tirkî ya (gelen), me'na yay ameyox a.
gîdan: Na kelîma Tirkî ya (giden), me'na yay şiyayox a.

Dûmahîka nivîsan * Dûmahîka nivîsan

Ma Salman Ruşdî...

ku reaksiyona ku hukûmet, dezge û piraniya ronakbîrên Ewrûpi ji bo Salman Ruşdî û ji bo azadiya fikrên wî dan xuyakirin, li ser gelek mesele, maf û azdiyên kes, an milletên din nayê nişandan, pîrsa "gelo" yek mezin di serê meriv de çêdibe. Ma li Iranê, Pakistanê, Iraqê, Lubnanê, Suûdiyê, li welatên Asya, Afrika û Latîn Amerikayê bi hezaran biryar û hetta kiryarên wek ê Salman Ruşdî ninin. Ma azadiya fikrî bes divê ji Salman Ruşdî re, yan bes ji fikrên ne ligor baweriyên isalmê re hebe. Yan gelo Ewrûpi divê reaksiyonê gava serê derziyê bigihîje wan nişan bidin? Gelo ne bal-kêş e ku reaksiyona li dijî qetliama Helepeçê negihîşt nivê ya ji bo Salman Ruşdî?

Di reaksiyona mesela Kurdî de eczezi û poz-bilindiyek Ewrûpi ji xwe nişan dide. Loma ji propaganda bi rehetî kare berê xwe bide kûrkirina dijminatîya nav gelan û piçûkdîti-na gelên dinya sistîyan. Gelek ecêb e ku ronakbîrên Ewrûpi vê yekê nabinin yan di ser guhê xwe re davêjin.

Azadiya fikrî divê ji bo Salman Ruşdî hebe. Lê ne bes ji bo wî tenê, ji bo her insan, her ronakbîr her milletê dinyayê ji. Em dengê xwe ji bo Ruşdî bilind dikin. Lê ne bes ji bo wî tenê, ji bo her insan, her ronakbîr û her milletê ji azadiya xwe bêpar ji.

Êsirên kampên...

tespîtkirina serbûriyên xwe li ser kaxetê belkî ji hin kabûsên xwe xelas dibû.

Malbata wî ji rizqê xwe birrîbû û gelek qarton civandibûn ku ji rismên wî dagirtî bûn. Hemû ji bi teyarên Iraqî hatibûn risimandin ku gundê wî bombaran dikirin, bi extiyarên wek dezî ku li erdê dirêjkirî bûn û extiyarên wek dezî(ta) ku li hewa dipekiyan ku ji ber bombaran di nav panîkê de dipengizîn. Rismên xwe bi serbilindî nişanî wan mêvanên biyanî yên ecêb dida. Tê digihîşt ku divê meriv li ser hemû merhelan bipeyiviya, belav bikira ji bo ku zêdetir kes pê bihesiya.

- Behsa me bike. Bike ku bira hemû dinya bi qedera me bihese, komîta pêşmerge got bi hêvîdarî gava em bi rê ketin. Refên bi hezaran penaberan dor li xaniyê îdara kampê girtibûn gava em meşiyên. Giş bêdeng, hişbûyî, awirên wan li me, bi hêviyên kelofûrî. Behsa me bike.

Min ahd kir ku behsa wan bikim.

(EXPRESSEN)
23 Sibata 1989

Li Iraqê zarok tîn...

Li gor raporê, gelek zarok ji piştî tîn girtin, bê şop "wenda" dibin. Di Nîsan û Gulana 1981ê de li Besra 4 zarok "wenda" bûn. Di navbera 1979 û 1982'an de 110 kes "wenda" bûn ku ew ji alî hêzên emnî (ewlekarî) hatibûn girtin. Di navbera salên 1980 û 1985'an de 178 kes bi vî awayî "winda" bûn, bi kêmasî 17 kesên ji wan di binya 17 salî re bûn.

Sala 1983'yan bi hezaran Kurd piştî hatin girtin ji bal hêzên Iraqî, "wenda" bûn, gişt ji eşîra Barzaniyan, ji herêmên Barzan û Mêrge Sor bûn. Di Tebaxa 1983'yan de 8.000 însan bi konvoyên eskerî hatin rakirin û hê ji kes hay ji qedera wan nîne. 315 kes ji wan zarok in ku di navbera 8 û 17 salî de ne.

Rapora Amnestiyê dide xuyakirin ku gelek zarok ji jî dêvla malbat û mezinên wan wek rehî tîn girtin, da ku mezinên wan werin xwe teslîmî hukûmetê bikin.

Di Gulana 1983'yan de ji eşîra serokê dinî yê Şîîyan Muhammed Baqir al-Hakîm 130 kes hatin girtin. 12 ji wan zarok bûn.

Di navbera Îlon û Çirîya Pêşîn

a 1985'an de li bajarê Suleymaniyê 300 zarokên Kurd hatin girtin ku xwedêgiravî malbatên wan li dijî hukûmetê ne. Bi girtinê, carna dixwazin ku mezinê malê werin xwe teslîm bikin. Carna ji dixwazin ji piçûkan agahdariyê li ser mezinên malê jê bigirin. Yê ku li Suleymaniyê hatin girtin, ji wan 3 sala 1985'an di bin îşkencê de mirin 29 ji wan di Çileyê Paşînê 1987'an de hatin îdamkirin û yê mayî jî qedera wan ne diyar e.

Gelek zarokên din jî tevî dê û bavê xwe tîn girtin û bi wan re di zindanan de dimînin.

Kêmtirîn 30 metodên îşkencê

Li gor raporê di zindanan rejîma dîktatorî ya Iraqê de kêmtirîn 30 metodên îşkencê tîn bikaranîn, ku di nav wan de lêdan, feleqe, şewitandin, îşkence elektrîkê, birrîn û birîndarkirin jî hene. Îşkencekir, çavê girtiyan derdixin, poz, guh, pêşir û penisên wan jê dikin, dest û piyên wan qut dikin. Gelekên wan îşkencan bi zaro-

Pêşdeçûyîna Kurdzaniyê...

çavkaniyeke baş bibîne. Çavkaniyeke awa kêrhatî pêwîst e, ku ji aliyê komîsyoneke zanistî ve bê amadekirin, bi serê xwe karê kesekî nin be.

Di rewşa îroyîn de, gelek problemên Kurdên ku li Ewrûpa dimînin hewcedarî lêkolînên zanistî ne. Rewşa karkerên Kurd, xwendekarên Kurd, zarok û jinên Kurd, multeciyan polîtîk, ji gelek aliyên pêwîst e ku bîne lêkolandinê. Di vî warî de xebatên sosyolojîk nayên çêkirin, li van welatên Ewrûpa pîr çand (kultur) li bal hev dijîn, tesîrên wan li ser hev çî ne? Pêwîst e, bersîvên van pirsan bînin dayîn.

Wek mîsal, îstatîstîkên rast û baş li ser Kurdên ku îro li welatên biyanî dijîn, tune ne, li ser vî nifusa Kurdan analîzkirina faktorên mayîn ne hatine lêkolandin. Di warê karên rêxistinî, çandî û sosyolîk de, rewşa Kurdên ku li Ewrûpayê dimînin, pêwîst e, bi çavekî zanistî bê lêkolandin. Bi taybetî, tesîrên zimanê Kurdî, ji bo zarokên Kurd çî ye? Ev pirsana jî lazîm e bînin lêkolandinê.

Wek van mîsalan, bi sedan problem bê lêkolandinî mane. Îro li Ewrûpayê bersîva pîrsa "Kurd çî dixwazin" tenê "Kurd bîndest in, dixwazin azad bibin" nîne. Bersîva "Kurd çî dixwazin" bi taybetî, bi bersîva pîrsa "Kurd Kî ne" ve girêdayî ye. Ev yek jî, giringiya karên Kurdzaniyê nişanî me

dide.

Li Ewrûpa, li Kurdistanê û li welatên Kurdistan bîndest kirine, îro bi sedan Kurdzanên hêja û bijarte hene. Ew, serbilindî û rûmeta gelê Kurd in. Gelê Kurd jî, pêwîst e li wana xweyî derkeve, wan biparêze. Di vî warî de, heta nuha gelek kêmasî pêsta hatine. Ji ber kar û xebatên xwe yê hêja û zanistî, van Kurdzanan tu west ji aliyê me de bi xelatekê, bi nişanekê û bi hurmetnameyekê ve nehatine pîrozkirin. Ne tenê bona Kurdzanan, ev yeka, ji bo nivîskar, hunermend û ronakbîrên mayîn jî, derbaz dibe. Bi taybetî nîfşê nûgihîştî hewcedarî teşvîk, cesaret û alîkariyeke maddî û manewî ye. Em, wek neteweyekî qedre van kesan negrin, wê kî bigre? Kî, çawa, çî wextî, ji ber çî, bi çî ve, bi navê çî kê, ev xelat û nişan wê bînin dayîn, pêwîst e, formulasyonê vê yekê jî, baş bê amadekirin. Di van salên dawîn de, li ser xebatên Kurdzanan, li ser jiyîna wan, gelek lêkolînên baş di kovar û rojnameyên Kurdî de hatin çapkirin, bi wan re hevpeyvinên giring hatin çêkirin, bi bawerîya min ev yeka destpêk û gaveke gelek baş û kêrhatî ye.

Ji bo problem û serêşiyên Kurdên li Ewrûpa û li Kurdistanê, ji bo safîkirina problemên Kurdzaniyê bi xwe, pêwîst e, di nav demekê de li Ewrûpa mercên konferansekê navnetewî ya Kurdzaniyê bê amadekirin. Roja

pêkanîna konferansekê wusasan, ji zû de ve hatiye û bihuriye û dereng jî ketiye. Di sala 1987'an de li Almanya Federal konferansekê wusasan hate rojevê, lê bi ser neket. Di konferansekê Kurdzaniyê de hevdudîtiya bi sedan Kurdzan û Rohilatzanan, wê alîkariyeke mezin bide pêşketina Kurdzaniyê, ji aliyê din de, konferansekê wusasan, wê ji gelek problemên Kurdan re jî bi-be derman. Ji ber ku, ji za-nîne xweştir tu tiştêkî baş-tirîn tune ye, pencerederiyên nuh li pêşiya mirovan û netewan vedike.

* Ev rapora li ser pêşdeçûyîna Kurdzaniyê li Ewrûpa, di Konferansa Stockholmê de hatiye pêşkêşkirin (13-15.01.1989).

** M. S. Lazarev, Şekroyê Xudo, Celîlê Celîl, E. I. Vasilieva, M. A. Hasretyan, Heçiyê Cindî, Zera Usif, Kerîm Eyubî, Çerkez Bakaev, I. A. Simîrnova, J. S. Musaelyan (Yekîtiya Sovyet), Kemal Fuat, Cemal Nebez, D. N. Mackenzie, Franz Erhat, Günter Deschner (Almanya Federal), Joyce Blau, Helkewt Hakîm, G. Chaliand, Abdullah Merdux (Frene), Izzedîn Mustafa Resul, Kemal Mazhar Ahmet, Maruf Haznedar, A. Rahman Hacî Maruf (Iraq), A. Rahman Qasimlo, Qadirî Fettahî Qazî (Iran), Ismail Beşikçi (Tirkîye), Mirella Galletti (Îtalya), Martin van Brui-nessen (Holland), Leszek Dziegel (Polonya), Radoy Kristev (Bulgarîstan) Henry Harald Hansen, Kemal Elî, Cemşîd Heyderî, Reşo Zilan, Malmisaniy, M. Emîn Bozarslan, Omer Şexmûs (Swêd)...

X a ç e p i r s

Amadekar: S. Rêving

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
1												
2												
3												
4												
5												
6												
7												
8												
9												
10												
11												
12												

Çeperast: 1-a) Helbestvanekî Kurd e bi navê û deng e. Cara pêşîn di sala 1946'an de di zindana Mûsilê de dest bi nivîsandina helbestan kiriye. Heta niha bi navê "Şîn û Şadî" û "Dilistan" du dîwanên wî li Baxdayê çap bûne. Her wisa yek ji hostayên nesira zimanê Kurdî tê hesibandin. Zimanê wî pîr sivik û gelêrî ye. 2-a) Fêkiyek (bereavjî), b) Navê qezayekê li Kurdistanê Tirkîyê ku dikeve ser "sînorê Tirkî" û "Iarqê", nêzikî Zaxo, her wiha paşnavê dîroknivîsekî Kurd e (bereavjî), c) rih, kok, rih. 3-a) Xort, gînc an jî ciwan an kur, b) Kesê qaçax, eşqiya, diz, yê rîya xelkê bişelîne. 4-a) Maqam (yê sitrana), b) Nexwepiyek,

c) pronavekî Kurdî (bereavjî). 5-a) Xwarinek, b) Sola pêlava hespan. 6-a) Cûrekî sitranên folklorî, b) Ufuq 7-a) Nav tê dan, zirt dan, b) Heywanê "bi hemil", hemle, yê ducan. 8-a) Proanvek îşarkî, b) Navê rojekê, c) Gundek li Kurdistanê Iranê ku di sala 1982'an de hukûmeta Iraqê dabû ber bomban û ji 400 kesan bêtir kuştibû. 9-a) Pronavek, b) Pronavek di zimanê Kurdî de, c) Bereavjî, ters, 'ekîs. 10-a) Pronaveke pirsiyarê, b) Navê zilaman (bereavjî), c) Cihê mirov, heywan û tirimbêl li ser diçin. 11-a) demek ji rojê, b) Belê, balam, c) Daçek (bereavjî). 12-a) Mirov an heywanê bi şev di tariyê de tê dîtin yan kesên bi

şev di tariyê de diçin di ziyê an kuştinê an bi rêbarî derbas dibin, b) Ne xirab, çak, çê (bereavjî), c) Kûçik.

Serejêr: 1-a) Şelale, b) Navê bajarekî li Kurdistanê Iraqê. 2-a) Me'ne (bi Soranî) (bereavjî), b) Ci-hê bi av an darê li erdê bi av şîn bibe, c) Pronaveke îşaretê. 3-a) Bajarek li Kurdistanê Tirkîyê, b) Bi Soranî "alî", "teref", c) Evrazî, hevrazî. 4-a) Sînonîmek bo "rih", b) Navê geliyekî bi navê û deng ku hukûmeta Tirkîyê li dawîya salên 1920'an gelek jin û zarok û pîrên Kurd lê kuştin, c) Bi Soranî "vir", "vêdê", 5-a) rengêk (bereavjî), b) Vajiya "nenas"ê, kesê ji meriv re ne biyanî (bereavjî). 6-a) Pirsiyarek, b) Navê eşîreke mezin di navbera Diyarbekir û Sêrtê de. 7-a) Dîn, ayîn, b) êş, kulxem, c) Heywanekî pîr piçûk. 8-a) Şaqa, yarî, henek, tinaz, b) Pronaveke îşarekî (bereavjî). 9-a) Li çiyên cihê ku çûna wir an lê meşiyên pîr zahmet e, b) Keça birayê meriv (bereavjî). 10-a) Navê mehekê. 11-a) Fêkiyek (bereavjî), b) Kesê li ser piştê hesp, mehîn, qantir an dewarekî, ne peya. 12-a) ard, b) Zilamê ku rîha wî dernekeve, nayê c) Belê, e (bereavjî).

Afganîstan: Ber bi ku ve?

Yekîtiya Sovyet şertên Peymana Cenevreyê ya li ser pirsê Afganîstanê bi cîh anî û di wextê xwe de leşkerên xwe ji Afganîstanê kişand.

Li gor Peymana Cenevreyê, diviyabû ku DYA, Pakîstan û Bîrîtanya ji wek Yekîtiya Sovyetê şertên peymanê bi cîh binin û alîkariyên xwe ji muxalefeta

xwe de li hev nakin. Bi taybetî Îran dixwaze giraniya xwe dayne û hukûmeteke hevalbend ji xwe re ava bike. Daxwaza Îranê li Afganîstanê avakirina dewletek "îslamî" ye.

Dema mirov ajansên Ewrûpî guhdarî dike û rojnameyên wan dixwîne, mirov wisa zen dike ku hukûmeta Afganîsta-

tên parastin. Ji zêdeyî 5-6 meh in ku leşkerên Sovyetî terka van bajaran kirine, lê heya niha yek ji van bajaran neketiye destê paşveriyên.

Îro muxalefeta Afganîstanê li ser bingeha jîholêrakirina "komunîstan" li hev hatin û hukûmeta xwe îlan kirin. Herçiqas Partiya Gel a Demokratîk a Af-



Afganîstanê qut bikin. Diviyabû ku destê xwe ji Afganîstanê bikişînin. Armanca Peymana Cenevreyê helkirina pirsê Afganîstanê bi riyekî aştîyê bû. Lê pîrr mixabin DYA, Bîrîtanya û Pakîstan weke ku di peymanê de îmzeyên wan tunebin, alîkariya xwe didomînin û destên xwe ji Afganîstanê nakşînin. Îro bi taybetî DYA û Bîrîtanya çek û roketên nûjen didin hêzên li dijî hukûmeta Afganîstanê. Bi van çek û roketan bi hezaran însanên bêşûc tîr kuştin û avahiyên civakî tîr xirabkirin.

Dema Peymana Cenevreyê hate îmzekirin, hêvî ew bû ku li Afganîstanê koalîsyonek çêbibe, hemû hêz werin ba hev û hukûmetek netewî ava bikin. Lê belê îro ev hêvî ji qela bûye. Muxalefet bi xwe di nav

nê li ber ketinê ye.

Di çapemeniya Ewrûpî de tiştekî din bala mirov dikşîne. Ew, talankirin, xirakirina avahiyên civakî ji ber ku Yekîtiya Sovyetê yan jî welatek din ê sosyalîst ava kirine- û sondxwarina kuştina hemû komunîst û sosyalîstan re çavê xwe digrin. Him qebûlkirina qirkirina piraniya gelê Afganîstanê û him jî qalkirina mafên însanî ne karekî rast e. Ya rastî ew e ku hêzên fanatîk û kevneperest ên Afganîstanê berî ku Yekîtiya Sovyet leşkerên xwe bikişîne Afganîstanê, dest bi qirkirin û talankirinê kiribûn.

Îddîyên çapemeniya Ewrûpî ne di cî de ne. Bajaren Afganîstanê wek Herat, Kandarhar û Celalabad ji mêj ve ye ku tenê ji alî hêzên hukûmetê ve

ganîstanê destê xwe yê aştîyê ji dirêjî wan kir jî, tu raxbet nedît. Wisa xuya ye ku "Şûra" di xwînrijandinê de biryara xwe daye. Rojname Partiya Hawîrdor a Berlîna Rojava Die Tageszeitung li ser vê yekê wiha dibêje; "Ev mucahidîn, di çapemeniya me de wek "qehremanên azadiyê" tîr nasandin. Wisa tê zanîn ku ew çekên xwe li dijî dagirkerên Sovyetî bi kar tînin. Lê belê ew yeka ha ji binî ve ne rast e." Rojnamevan Jochen Hippler di nivîske xwe de wiha dibêje; "Di rojeva muxalefetê de êrîşkirina ser avahiyên sîvil, daxistina teyareyên sîvil, qirkirina êsîran, îşkencekirin û ticareta eroînê heye."

Neheqiyek mezin li biyanîyên akademîk ên li Swêdê tê kirin

Îro bi hezaran biyanîyên akademîk ên li Swêdê yan bê kar in yan jî karên din dikin. Ango biyanîyekê mihendîs, doktor an jî mamoste pîrr caran di kare paqijiyê, paketkirinê yan jî di postê de kar dikin. Ji bo karên wiha xwendina unîversîteyê ne pêwîst e.

Li gor lêkolîna SIPA (Rêxistinek e, ku ji biyanîyên akademîk pêk tê), ji biyanîyên ku xwedî dîplomayên bilind in, tenê 1/5 (ji pênc parî pariyek) li karên li gor xwendina xwe kar dikin. Piraniya wan di karên demî de kar dikin. Herçiqas li ser vê yekê ji karbidestên hikûmeta Swêdî re hatibe nivîsandin jî tu tedbîr heya îro nehatiye standin.

Carna biyanîyên ku li welatê xwe unîversîte xwendine û bûne xwedî dîploma, mecbûr dimînin ku xwendina xwe ducar bikin. Ji ber ku karbidestên Swêdî dîplomayên wan bi awakî resmî qebûl nakin yan jî bawerî bi wan naynin. Herçiqas kesê biyanî xwendina xwe ducar dike jî lê cardin di peydakirina kar de gelek zehmetiyê dibîne.

Li gor lêkolîna SIPA, karbidestên Swêdî û şirketên Swêdî di derheq sîstema hindekarî ya welatên din de gelek tiştan nizanin. Ji ber vê yekê jî herçiqas puanên yekî biyanî jî yên yekî Swêdî zêde bin jî şirketên Swêdî kesê Swêdî tercîh dikin.

Helbet sedem ne tenê nezanîna derheq sîstema hindekarî ya welatên din de ye. Karbidest û şirketên Swêdî bawerî bi biyanîyan naynin. Berî ku şirketek kar bide yekî/yeka biyanî, di derheq wî/wê de lêkolîn dike, ji îstîxbarata Swêdî (SEPO) dipirse. Eger jî %1 jî şik hebe kar nadin kesê biyanî. Carna jî biyanîyên ku bi salan li şirketekê kar kirine, li ser rapora îstîxbaratê jî kar tîr avêtin.

Ji aliyê din şirketên Swêdî jî hikûmeta Swêdê daxwaz dikin ku ji "derve" karkerên xwedî tecrûbe û bi dîploma binin. Meqseda wan bi gotina "derve" welatên wek Bîrîtanya Mezin, Almanya Federal, Avusturya û hwd. in. Navê vê yekê raste rast nijadperestî ye, dijîtiya biyanîya ye û ne tiştekî din.

Welatên sosyalîst dest bi çekdaxistinê kirin

Piştî însiyatîfa YKSS a yekalî ya çekdaxistinê, welatên din ên sosyalîst jî yekalî dest bi çekdaxistinê kirin.

Wek tê zanîn demek berê YKSS, ji bo hemû dinê îlan kir ku wê ji hêzên xwe yên leşkerî 500 000 leşker kêmkiribû. Ev hejmar wek tevayîya hêzên leşkerî yên Almanya Federal e.

Wezaretê Bergirî ya Macarîstanê di dawîya meha Çileyê Paşîn 1989'an de beyan kir ku wê hêzên xwe yên leşkerî %8.8 (nêzî 9300 leşker) kêmkiribû.

Komara Demokratîk a Almanya jî ji ordiya xwe ya netewî ya gelî wê 10 000 leşker kêmkiribû. Komara Demokratîk a Almanya wê ji butça bergirî %10 daxîne jêr.

Bulgarîstan wê ji butça bergirî %12 daxîne jêr û ji ordiya xwe 10 000 leşker kêmkiribû. Ji bil van wê Bulgarîstan 200 tank û 20 balafiran xurde bike û ji hêzên xwe yên deryayî 5 beşan jî holê rake.

Çekoslovakya wê ji butça bergirî %15 daxîne jêr û ji ordiya xwe jî 12 000 leşker kêmkiribû.

Polonya par jî ordiya xwe 2 hêz belav kir û îsal jî wê hêzên din belav bike.

YKSS wê di sala 1989'an de 3 hêzên (regement) xwe ji Polonyayê, ji Macarîstanê 10 000 leşkerên xwe, 3 000 makîneyên leşkerî û 200 topên xwe paşde bikişîne.

Di programa çekdaxistinê ya welatên sosyalîst de kêmkirina hin sîstemên çekan jî heye.

Li Sovyet hilbijartina parlamentoyê

Yekîtiya Sovyetê, hilbijartina xwe ya di 26'ê Adarê de wê bi sistemek nuh pêk bîne. Li gor vê sîstema nuh, wê gelê Sovyetê bikaribe di nav çend nûneran de yekî hilbijêre.

Heya nuha 105.000 rêxistinên RKYS (Partiya Komunîst a Yekîtiya Sovyetê) ên herêmî jî bo nûneran dengên xwe dane. 31.500 nav pêşniyarî Komîta Merkezî bûne. Ji bilî vê jî, ji xelkê, nêzî 12.000 telgraf û name ji bo nûneran ji Komîta Merkezî re hatiye.

Li gor qanûna hilbijartinê ya nuh ku di dawîya sala 1988'an de hat qebûlkirin, PKYS wê nûnerên hilbijartinê pêşkêşî komîsyona hilbijartinê bike.

Parlamentoya Yekîtiya Sovyetê wê di 26'ê Adarê de bête hilbijartin. Di hilbijartinê de du grup hene. Grup-1 ji 1/3'ê 2250

endamên parlamentoyê ku ji alî 257.300 kesî xwedî deng tîr hilbijartin pêk tê. Grup-2 jî ji alî komar û navçeyên otonom ên Sovyetî tîr hilbijartinê. Hemû komar û navçeyên otonom bêyî ku mirov bala xwe bide mezinahiya gelê wan dê li parlamentoya Sovyetî bêtîr temsîlkirin û hejmara nûnerên wan wê wekhev be. Nûnerên komar û navçeyên otonom, wê li ciyên kar û taxan bêtîr hilbijartin.

Ji 31.500 navên ku ji alî rêxistinên PKYS ên herêmî hatibûn pêşkêşkirin, piştî ku organên komar û navçeyên otonom li van hûr bûn, 207 nav ji bo nûneriyê man. Ji 12.000 navên ku raste rast ji KM ya PKYS re hatibûn bi rêkirin, tenê 302 kesî piştigirîya KM standin. Nêzî nivê van kesan di lista rêxistinên PKYS ên herêmî de jî hebûn.

Fîşa abonetiya Armancê

- Salek
- Şeş Meh

Abonetiya salekê
120 Skr. 120 FF. 20 \$ 35 DM

Tarîx:

Nav û paşnav:

Navnîşan:

Welat:

Postgiro: 50 37 99-9 Sweden

Heqê abonetiya xwe li ser postgiroya jorê bişînin. Fotokopiya kvîtoya heqê abonetiye û fîşa jorin dagirin li ser adresa jêrin ji me re bişînin.

Adres: P.Box: 6004, 172 06 Sundbyberg/Sweden